

K.T.
ZANÎNGEHA MARDÎN ARTUKLUYÊ
ENSTÎTÛYA ZIMANÊN ZINDÎ YÊN LI TIRKIYEYÊ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Ê ÇANDA KURDÎ

Teza Lîsansa Bilind

KURDÊN ARÎ: MÎT, DÎROK Ê ÎDEOLOJÎ

Vejdi DEMİR

16711011

Şêwirmend
Dr. Shahap VALÎ

Mêrdîn-2019

T.C.
MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ
TÜRKİYE'DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANA BİLİM DALI

Yüksek Lisans Tezi

ARÎ KÜRTLERİ MİT, TARİH VE İDEOLOJİ

Vejdî DEMİR

16711011

TEZ DANIŞMANI

Dr. Şahap VALİ

MARDİN-2019

KABUL VE ONAY

Vecdi Demir tarafından hazırlanan **KURDÊN ARÎ: MÎT, DÎROK Û ÎDEOLOJÎ** adındaki çalışma, Savunma Sınavı Tarihi tarihinde yapılan savunma sınavı sonucunda jürimiz tarafından Kürt Dili ve Anabilim Dalı, Kürt Dili ve Kültürü Bilim Dalında (varsa) **YÜKSEK LİSANS TEZİ/DOKTORA TEZİ/PROJESİ** olarak oybirliği / oyçokluğu ile kabul edilmiştir.

Prof. Dr. Abdurrahman Adak

Başkan

Dr. Shahab Vali

Dr. Abdurrahim Özmen


TAAHHÜTNAME

TÜRKİYE'DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Mardin Artuklu Üniversitesi Lisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum “KURDÊN ARÎ: MÎT, DÎROK Û ÎDEOLOJÎ” adlı tezin/projenin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve tez yazım kılavuzuna uygun olarak hazırladığımı taahhüt eder, tezimin/projemin kağıt ve elektronik kopyalarının Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım. Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

- Tezimin/Projemin tamamı her yerden erişime açılabilir.
- Tezim/Projemin sadece Mardin Artuklu Üniversitesi yerleşkelerinden erişime açılabilir.
- Tezimin/Projemin 3 yıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, tezimin/projemin tamamı her yerden erişime açılabilir.

30/07/2019


Vejdi Demir

KURTE

Xebatên li ser etnolojiyê ku di sedsala 19 an de bi teqleke baş pêşketine, bi dîrok, mît û bi îdolojiyê re bûye yek û gelek caran parametreyên objektîfîyê berovajî kirine. Di heman sedsalê de li Ewropayê Mîta Arî, ya ku bi taybetî bi rêya filolojiyê avabûbû, ji ber gotin û îfadeyên ku di hundirê xwe de etîketên mîna raserî, rûmet û berzbûn dihewand di demeke kurt de bi lêvkirina neteweyên di biniya xwe re dîtîne, bi taybetî jî yên Samî wek dijmin dihesibîne. Mîta Arî ku di maweya vê sedsalê de bi alîkariya zanyarên wek Jones, Herder, Renan taybetiyek şecereya îdolojiyê bi destxistî, bi van pêşenayan tevdigere: dergûşa (welatê) şaristaniyê Hindîstan e û zimanê herî mikemmel jî Sankrîtî ye.

Di nivîsandina dîroka Kurdî de em tovên ewil ên mîta Arî di rûpelên kovara *Jînê* de dibînin. Di kovara *Jînê* de ku ji aliyê Kürdistan Tealî Cemiyeti ve tê derxistin, di nîqaşên ku li ser etnolojiya kurdan hatine kirin de koka îranî derketiyê pêş. Paşê em ê di sala 1930 î de bibin şahid ku serokê serhildana Agiriyê Îhsan Nûrî Paşa, ew ê angaştê ku kurd bi koka xwe arî ne biparêze. Me di xebata xwe de ev yek bi kurtasî behs kirine, xebata me wek navend bi piranî li ser formulasyonên derbarê mîta Arî hatiye avakirin ku Cemşid Bender, Gürdal Aksoy û Siraç Bilgin di pirtûkên xwe de anîne zimên. Di dîmena van nivîskaran de ji Arîbûna kurdan, ji rabêja raseriyê an jî biçûkdîtina neteweyên din bêtir nosyona neteweyeke serbixwe ku ‘yê din’ cudatir e ji ber çavên mirov nareve. Di nivîsîna dîroka kurdan de di konteksta mîta arî de kirpandin, bi vî awayî ye ku kurd ji neteweyên cîranên xwe (bi taybetî ereb û tirk) cuda xwe dispêrin kokên neteweyeke din.

Bêjeyên Sereke: mîta Arî, dîroknivîsî, yê din, nasname, kok, rabêja neteweperwer, filolojî, dîroka kurdî

ABSTRACT

Since the 19th century; history, myth and ideology have been intertwined in the ethnological studies which gained a good momentum and mostly parameters of objectivity have been severely reversed. In the same century, the myth of Arî, which was created by philology in the European horizon, was transformed into the discourse of contempt and hostile sight in other nations, especially the Sami nations, in a short period of time because it contained statements and labels such as precedence, honor and supremacy. Throughout the century, the myth of Arî, which gained a feature of ideology of genealogy with the help of scholars such as Jones, Herder and Renan, set out from the following premises: The motherland of civilization is India and Sanskrit is the perfect language.

In the Kurdish historiography, we find the first sources of the myth of Arî in the pages of the magazine called *Jîn*. In the *Jîn*, the publication organ of the Kurdistan Ascend Association (Kürdistan Teali Cemiyeti), the Iranian origin has come to the fore in the debates on the ethnology of the Kurds. Afterwards, we witness İhsan Nuri Pasha, the leader of the Ağrı rebellion in 1930, defending the thesis that the Kurds are of Arî origin. In this study, these are summarized and the focus is mainly on the formulations of Cemşid Bender, Gürdal Aksoy and Sıraç Bilgin in their books about the myth of Arî. In the framework set out by these authors, rather than the discourse of the supremacy or underestimation of other nations, regarding the Arî origin of Kurds it is notable that the emphasis is on the fact that Kurds are different from the “Other” and are an autonomous nation. The emphasis of the Kurdish historiography in the context of the myth of Arî is on the fact that Kurds are based on a different ethnology from the neighboring nations (especially Arabs and Turks).

Keywords: myth of Arî, historiography, the Other, national identity, origins, nationalitarian discourse, philology, Kurdish history

ÖZET

19.yüzyıldan itibaren iyice ivme kazanan etnoloji çalışmalarında tarih, mit ve ideoloji iç içe geçmiş ve çoğu zaman nesnellik parametreleri ciddi oranda ters yüz edilmiştir. Aynı yüzyılda Avrupa ufkunda özellikle filoloji yoluyla kurulan Arî miti, içinde üstünlük, onur ve yücelik gibi ifadeler ve etiketler barındırmasından dolayı kısa sürede diğer ulusları, özellikle de Sami ulusları küçümseme ve düşman görme söylemine dönüşmüştür. Yüzyıl süresince Jones, Herder, Renan gibi bilginlerin katkılarıyla bir soykütük ideolojisi özelliği kazanan Ari miti şu öncüllerden hareket eder: Uygarlığın anavatanı Hindistan olup en mükemmel dil Sanskritçedir.

Kürt tarihyazımında Arî mitinin ilk tohumlarını *Jîn* dergisinin sayfalarında buluyoruz. Kürdistan Tealî Cemiyeti'nin yayın organı olan *Jîn*'de Kürtlerin etnolojisi üstüne yapılan tartışmalarda İranî kök öne çıkmıştır. Sonrasında 1930 Ağrı isyanının lideri İhsan Nuri Paşa'nın Kürtler'in Arî kökenli olduğu tezini savunduğuna tanıklık ederiz. Çalışmamızda bunlar özet geçilmiş olup odak daha çok Cemşid Bender, Gürdal Aksoy ve Sıraç Bilgin'in kitaplarındaki Arî mitiyle ilgili dile getirdikleri formülasyonlar üstüne kurulmuştur. Bu yazarların kurduğu manzarada, üstünlük söylemi veya diğer ulusları küçümsemekten çok Kürtlerin Arî oluşuna ilişkin, 'öteki'den ayrı ve özerk bir ulus olduğu vurgusu dikkatlerden kaçmamaktadır. Arî miti bağlamındaki Kürt tarihyazımında vurgu, Kürtlerin komşu uluslardan (bilhassa Arap ve Türk) farklı bir etnolojiye dayandığı şeklindedir.

Anahtar Sözcükler: Arî miti, tarihyazımı, öteki, kimlik, kökler, ulusalcı söylem, filoloji. Kürt tarihi

NAVEROK

KURTE	ii
ABSTRACT	iii
ÖZET.....	iv
NAVEROK	v
KURTEBÊJE	vii
PÊŞGOTIN	viii
DESTPÊK	1
Mijar	1
Sînorên Mijarê.....	1
Çavkaniyên Mijarê	2
Rêbaz ô Metodoloji.....	3
1-DESTPÊKA NETEWYÊ Û ÎNŞAKIRINA MÎTAN.....	4
1.1. Rabirdûyeke Zindî	4
1.2. Mît û Netewe	6
1.3. Netewe û Înşa	7
1.4. Mît û Dîrok	8
1.5. Mît û Vegotin	9
1.6. Rabêja yê Din	10
2MÎTA ARÎ DI ASOYA EWRUPA DE	14
2.1. Peyva Arî.....	15
2.2. Nerîta Yafesî	17
2.3. Teoriya Koçê.....	20
2.4. Raseriya Neteweyê	21

2.5.	Fîlolojiya Arî	23
2.6.	Di Romantîkan de Mîta Arî.....	26
2.7.	Rabêja Renan.....	28
2.8.	Sîstema Dumezil.....	31
2.9.	Terka Sahneyê	36
3KURDÊN ARÎ Û DÎROKNIVÎSÎ.....		37
3.1.	Mît û Edebîyat	37
3.2.	Wek Mîteke Neteweyî: <i>Mem û Zîn</i>	37
3.3.	Hevîyên Ehmedê Xanî.....	38
3.4.	Peywîra Alegoriyê	40
3.5.	Pirsgirêka Kokan	41
3.6.	Rabêja Hebûnê: Nasnameya Arî Ya Kurdan	44
3.7.	Cejna Arî: Newroz	48
3.8.	Baweriyên Arî û Nerîta Kurdan	52
3.9.	Mîthraîzm	52
3.10.	Zerdeşt û Zerdeştî	54
3.7.	Elewîtî	58
3.8.	Zimanê Kurdî û Jêdera Arî.....	59
3.9.	Kurd û Samî.....	61
ENCAM		65
ÇAVKANÎ		68

KURTEBÊJE

Amd :Amedekar

B. :Berg

bnr. :binêrin

B.Z. :Beriya Zayînê

h.b. :heman berhem

hwd. :her wekî din

r. :rûpel

wer. :werger

Weş. :Weşanxane

PÊŞGOTIN

Teza me ya bi navê *Kurdên Arî, Mît, Dîrok; Îdeolojî* ketiye pêy vê şopê; ya ku di têgihîştina kurdan de pirsgrêkên kokan, nasnameya xweserî, dîroka kevn a kurdî û hişmendiya nerîtê çawa cih girtine û di desten çend nivîskarên diyarkirî de kîjan û çî şîrove hilberîne. Di vê tezê de navend li ser mîtekê, li ser mîta Arî ye. Ev mît ji çend aliyan ve hatiye ravekirin (filolojî, nasname, kok, şaristanî hwd.) û di dawiyê de rengvedanên wê di dîroknivîsiya kurdan de çawa cih girtiye, hatiye nirxandin.

Di serî de pênaseya mîtê, têkiliya wê bi meseleyên vegotinê, çêkirina hişmendiya neteweyî wek teoriyeke bingeîn hatiye pêşkeşkirin. Di beşa yekem de giranî bêtir li ser fonksiyon û erken mîtê ne. Em dizanin mît ji aliyê zanistê ve qadeke berfireh nîşan dide. Lakin di teza me de behskirina wê bi hurgilî ne pêwist e. Ji ber ku armanca me tenê ew bû: di dîroka ku tê de derbas bûye mîta Arî çî şop hiştine û tesîr li ser kîjan hêmanan kiriye? Jixwe ev mît bi taybetmediyên xwe yên cûrbicûr, di ol, dîrok, nasname, siyaset û antropolojîyê de roleke girîng lîstiyê.

Di beşa duyem de derketin û pêşdeçûna mîta Arî wek kronolojîyê hatiye derbirîn. Daxwaza me ne tenê vegotina çîroka vê mîtê bû. Me xwest pê re behsa çend parezvanên wê jî bikin. Bi rastî me bêtir behsa Renan û Dumezil kir ku her du nav di pêşdexistina vê mîtê de gelek tesîr kirine li ser raya giştî.

Herçiqas di nava van her sê nivîskaran de ji hêla pejirandin û nêzîkbûna mîta Arî ve ciyawazî henin belê di wan de me gelek motîvên hevpar û niqaşên watedar jî tespit kir. Divê bê gotin, her sê nivîskar jî pirtûkên xwe bir Tirkî nivîsine û jêgirtinên ku ji bo nirxandinê me daxilî teza xwe kirine, ji teref me ve hatine wergarandin.

DESTPÊK

Xebatên li ser mîtan di sedsala 19 an de bi awayekî profesyonel him pêş de ket û him jî hêdî hêdî di nava gramereke îdeolojîk de şêwe girtin. Di vê sedsalê de mîta Arî yekem car di nav xebatên filolojî de xwe di asoya Ewropî de rê da.

Mijar

Sedsala 19 an ji aliyekî ve ne tenê filolojiyê, xebatên wek etnoloji û antropolojiyê jî qedeme qedeme di raya giştî de tegihiştinên felsefî û siyasî bi xwe re anîn. Di vê heyamê de bawerî û ol hêdî hêdî cihê xwe ji fikrên pozîtîvîst re hişt û ev diyardeya olî ku bi sedsalan nerîta Ewropî diyarkiribû êdî li ber alternatîvên din lawaz dima. Ji ber vê yekê her ku çand û nerîtên derveyî Ewropa dihat kişîkirin diyardeya olî, bi taybetî jî baweriya Mesîhîtiyê têk diçû û ên wek mîta Arî dibûn alternatîvên xurt. Di vê xebatê de me hewl da ku em mîta Arî analîz û şîrove bikin bê ka di çend nivîskarên kurdan de ev mît bi çi wateyê de hatiye famkirin û bi kar anîn.

Sînorên Mijarê

Xebata me di sê beşan pêk tê. Di beşa yekem de beriya ku em behsa mîta Arî bikin, wek meseleyên teorîk ve, çend hêmayên bi xebata me têkildar, mîna mît, dîrok, edebiyat, nasname, netewe hwd. me bi hurgilî behsa wan kir.

Di vê beşê de me hewl da ku mît çawa tînan avakirin, çi peywîrê tînan cih, di kîjan nerîtan de bêtir bi fonksiyonel in em rave bikin. Di beşa duyem de derketina mîta Arî di asoya Ewropî de çawa pêk hatiye, beramberî bawermend û pîrozvanên vê me pêşkeş kir.

Di beşa sêyem de me mîta Arî wek kontekst girt û ketin pêş şopa çend rewşên kurd, yê ku ji hêla vê mîte ve dîrok, çand û nasnameya neteweya kurdan şîrove û pêşkeş kirine. Nivîskarên wek Gûrdal Aksoy, Siraç Bilgin, Cemşîd Bender bêtir bala me kişand. Belê hin caran me behsa nivîskarên din jî kir, yê ku di vî warî de bi ya me kêmtir bandor li ser raya giştî ya kurda kirine. Di nav sê navên

ku me ku li jorê destnîşan kiriye, wek mafekî lazim em bêjin ku yê ku herî analitik û li gorî metoda zanistê li di çarçoveya mijarê de nivîsiye, Gürdal Aksoy e. Aksoy ji aliyê rê û rêbazên dîroknasiyê çêtir xwe ji xefka pêşdarazî û ‘alegoriya neteweyî’ rizgar kiriye û gelek encamên objektîvtir derxistiye holê.

Çavkaniyên Mijarê

Bi rastî îro di lîteraturê de pirtûkên di vî warî de pir in. Lê belê bi taybetî pirtûka Leon Poliakov a bi navê *Arî Miti, Avrupa'da Irkçı ve Milliyetçi Fikirlerin Tarihi* gelekî bi kêr me hat û xebata me dewlemmend kir. Poliakov di jiyana xwe ya lêkolîneriyê de bêtir li ser dîroka faşîzmê de sekinîbû. Piştî Şerê Cihanê yê 2 emîn li CNRSê bi salan xebitîbû û ketîbû pêy lêgerîna belgeyên ku bi jenosîda Cihûyan ve têkildar ve. Navenda xebatên Leon Poliakov analîz û famkirina antîsemîtîzmê ye. Bi taybetî pirtûka *Arî Miti, Avrupa'da Irkçı ve Milliyetçi Fikirlerin Tarihi* li mîta Arî hûr dibe û bi şopandina rengvedanên mîta Arî dixwaze xwînerên xwe serxwextî kiryar û fikrên Hîtlerîzmê bike. Bi ya Poliakov di dîroka Ewropa de bo nerîna kokên faşîzmê divê em biçin heta berîya hebûna Mesîhîtiyê.

Li ser filolojiya Arî di destê me de pirtûka herî baş û saxlem a Maurice Olender e, ya bi navê *Cennetin Dilleri - Tanrısal Bir Çift : Ariler ve Samiler* e. Di vî pirtûkê de Olender berhem û fikrên Herder, Renan, Max Mülller, Pictet û Grau analîz dike. Pirtûka Olender rê me dide ku bê çawa di nerîta zanistî ya Ewropa de hêleke reş heye ku bi riya filolojî hatiye zindîkirin. Belê li vir filolojî bûye amûreke îdeolojî û li ser ên din wek şûrê desthlardariyê şixûliye.

Di nav dîroknasên kurdan de, kesên ku mîta Arî wek rastiyeke empirîk û kurdevar qebûl dike, yek ji wan Siraç Bilgin e. Siraç Bilgin di nav vî nerîtê de yê herî bi kelecana û bawermendekî mutleq e. Di pirtûka *Aryan Mitolojisi, Yazatahar ve Homa* de bi hurgilî behsa bawerî, ol û mîtên Arî dike û wê bi formên pagan û semawî ve berawird dike. Helbet di têgihiştina Siraç Bilgin de mîtologyaya Arî cihekî wê yî payebilind heye û ne nerîta semîtîk û ne mîtologyaya Yûnana Qedîm nikare bigihêje asta wê. Ne tenê li gorî formên (çi ol çi mît) navborî gava ku mijar tê ser meseleyê, baweriyên Arî, mînak ji bo pêkhatina gerdûnê Bilgin li gorî fîzîka

nûjen şîrove dike. Herwiha Siraç Bilgin di wê bawêriyê de ye ku Zerdeşt ji malbateke proto kurd e û bêgûman pêxemberê gelên Arî ye.

Bi rastî Cemşid Bender ji aliyê xwendinê ve gelek tecrûbeyan dide xwîneran. Heger îdîayên ku Cemşid Bender pêşkeş dike îspat bibin yekî kurd li ji hêla xirûra netewî ve wê pir bextewer be. Lewra Bender şaristaniya Mezopotamya bir giştî diavêje bixçûka kurdan. Bi ya Bender şaristanî û jiyan, yekem car li Zagrosan dest pê kiriye. Qrel Nemrud, Hz. Brahîm û gelek legengên vê erdnîgariyê eslên wan kurd in. Dewletên qedîm, ên wek Babîl, Hûrrî, Mîtannî, Kassîtî, Urartuyî, Medya bi giştî kurd in û sermiyanê kurdan pêk tînin. Ji bilî wê gelek sembolen pîroz tenê yên kurdan in. Ji ber ku tofan li Kurdistanê pêk hatiye çiyayê Cûdî erdnigariya ku jiyan cara duyemîn lê dest pê kiriye. Herwiha bihuşta ku *Ahd-i Atîk* behsa wê dike, ya *Adn* li peravên Gola Wanê ye. Ya din Ebû Muslîm, Hellacê Mensûr, Cineydê Bexdadî, Beyazidê Bistamî, Ebû'l Wefa, Suhrewerdî, Baba Îshak û Seyyid Nesîmî bi giştî sofiyên kurd in. Heta Bender ilawe dike ku navên ku me destnîşankirine ji bo ku çanda kurdî biparêzin canên we fida kirine.

Rêbaz ê Metodolojî

Xwendina nêz îro ev metodeke ku ji lêkolîneran re derfeta hûrbûna analîza metnên armanckirî, guherîna wateyên wan û berawirdkirina taybetiyên nivîskaran dide. Di vê metodê de metn wek navenda xebatê tê hesibandin. Famkirin û analîza metnê pirsgrêka sereke ye û metn ji gelek aliyan ve (îdelojî, hermeneutîk, zimannasî) tê veçirandin. Gava lêkolîner li ser metnê hûr dibe (focusing) gelek caran wate û nuansên cûrbicûr jî xwe didin. Ev metod bi çend pirsên sereke dest bi kar dike: Metn tê kîjan wateyê? Armanca wê çi ye? Kîjan temayê tîne zimên? Ji bo xwîneran kîjan asoyê pêşkeş dike?, hwd. Bi 'xwendina nêz' (close reading) me pirtûkên Siraç Bilgin, Gürdal Aksoy û Cemşid Bender hemû xwend û îdîa û şîroveyên wan nirxand.

Ji hêla piştgirî û rêberiyê ve alikariyên Dr. Shahab Vali tuneba ev xebat qet dernediket holê. Loma bi taybetî ez sipasiyên mezin li mamoste û şewirmendê xwe Vali dikim.

Vejdi DEMİR
Mêrdîn-2019

1- DESTPÊKA NETEWYÊ Û ÎNŞAKIRINA MÎTAN

Di nivîsandina dîroka neteweperweriya kurdan de, yek ji mîtên bineçe ya ku herî pirr ji wê tê hez kirin dibêje, Kurd di eslê xwe de ji nijadeke Arî tîn. Xelîl Xeyalî, destana Kawa ya ku di *Şerefnameyê* de derbas dibe, di kovara *Jînê* de, bi awayekî neteweperwerî şîrove kiriye û parastiye ku Kurd bi eslê xwe ‘Îraniyên heqîqî’ ne. (Özcan 2007, 50-51) Li gorî Xeyalî, B. Z. di navbera salên 3000 û 2400 î de bi cihbûna hewzeya Ferat û Dîjleyê ya Arîyan, Kurd derketina ser sahneya dîrokê û bi damezrandina Împeratoriya Medan ve berdewamiya nijada xwe kirine. (Bitlîsî 1335, 779) Piştî gelek dîroknasên (û siyasetmedar) Kurd îdîayên Xeyalî kemilandin. Nivîskarên wek Cemşîd Bender, Gürdal Aksoy û M. Siraç Bilgin, yê ku îdia dike ku ku Zerdeşt pêxemberê Kurda ye, bûn parêzvanên herî sadiq ên vê teoriya Arî.

Dixwaze bila jê re Arî yan jî Aryan bê gotin (dawiya dawî herdu hemwate ne) nivîskarên ku şopa vê mîtê di *Tewratê* de jî kişf kirine henin. Lêbelê mîta Arî di sedsala 19 an de bi awayekî sistematîk herî pirr di bi riya filolojiyê ve hatiye dahênandin û di sedsala 20 an de di Elmanyaya Nazî de veguheriye amentûyeke siyasî.

1.1.Rabirdûyeke Zindî

Rabirdû li gorî teorîsyenên neteweyî tenê naye wateya demekê normatîv. Rabirdû ji gelek aliyên ve fersend û mifteya jîndarbûna gelekî diyarkirî ye. Ji ber ku ev fersend û mifte her tim di bîra rewşenbîrên neteweyê de ne, rabirdû di destên wan de wateyên nuh qezenç dike.

The *Necessary Nationê* de Gregory Jusdanis, bi awayekî ku xulaseya teoriya netewî gişî têxe nav xwe, pirsên wek mîteke netewî çawa tê çêkirin, bi kêrî çî tê û di xwe de çî dihevine bi awayekî vekirî neqil dike:

Wek xebatên dîrokî giş, mîteke netewî, bi başkirina rabirdûyê, jêbirina bûyerên ku êşê didin û mirov ji ber

wan fedî dike, berzkirina kes û bûyerên ku şopa wan maye, tê çêkirin. (Jusdanis 2001, 37)

Û li vir peyva efsûnî sêdaqat e. Sêdaqat xwediyê kakileke derûnî ye. Candarî, fedakarî û ciwakî, cewherên dînamîk ên vê kakilê ne. Bêguman yekîneyên netewî yên ku têk naçin bi kakilên ku dilsoziya wan hatiye parastin û giyanê ku li hember demê di ber xwe didin, tên meydanê.

Bi esasî navenda cureyên ramanên ku Jusdanis behs kiriye tu dibêjê qey ji gotara navdar a Ernest Renan ya bi navê *Netew Çi ye?* îlham stendiye. Li gorî Renan *jibîrkin*, ji bo ku neteweyek bibe neteweyekî heqîqî amûreke xurt e. Hetta li gorî wî pêşxistina zêde ya zanista dîrokê ji bo wî neteweyî bi xeter e.

Di vegotîneke netewî de, ji bo ku bibe netewekî mutleq û heqîqî, esasên wek ‘rehabilitaya rabirdûyê’, ‘jêbirina bûyerên bi êş û şerm’ hwd. ne mimkûn e ku mirov ferq neke di destnîşankirinên Renan, ên derberê girîngiya *jibîrkinê* de ne. Li gorî Renan:

Jibîrkin, heta dikarim jê re bibêjim wek xeletiyêke dîrokî, pêkerek e(faqtor) gelekî girîng e bo afirandina netewekî û pêşketinên di qada lêkolînên dîrokê de ji bo netewê bi gelemperî xeter e. (Ji ber ku) lêkolînên dîrokê bi rastî hin tiştan ronî dike, yên wek bûyerên terorî, yên ku di destpêka pêkhateyên siyasî de diqewimin. Helbet ên ku ji aliyên netîceyên xwe gelekî bi fêde ne jî, di nav de ne. (Renan 2016, 37)

Bi ya Renan hemû hemwelatîyên Fransîz mecbur in ku roja *Barthelemyê Ezîz* û komkujiyên sedsala XIII. yên başûr ji bîr bikin. Ernest Renan peyva dawî wiha qût dike: “*Halbûkî heqîqeta netewe ew e ku her kes bibe xwediyê gelek tiştên hevpar û bi heman şiklî divê gelek tiştan jî ji bîr bikin.*” (Renan 2016, 38)

Di dîroka Fransîyan de bi şîroveya Leon Poliakov dibe ku ev endîşe her ku çûbe bi awayekî travmatîk di nav nîşan de zêdetir bûye. Ji bo tevkarîya vê mijarê tespîtên Marc Bloch girîng in: “*Navê Fransaya me yê ku hat fêmkirin ku navê fatîh û*

dagirkeran e, wer xuyaye ku li nav bîrewerên me yên hestdar, demildest, hesta endîşeyeke trajîk çêkiriye.” (Poliakov 2001, 30)

1.2. Mît û Netewe

Di rastiyê de netewe-dewlet (nation-state) fikreke modern e û li her welatê ku avabûye, mecbûr e ku bi awayekî xurt xwe bi kok û dîrokê ve girêbide. Kok û diyardeya dîrokê ya ku îdîayê xurt dike, îdîaya berdewamî ya ku netewe-dewletê ji dîrokê girtiye, encax bi însakirin û sazkirina hafîzeyeke diyarkirî mimkûn e. Balkêş e, baweriya bi dahatûyê û xurtbûna destnîşanên hêzdar bi awayekî zêde bi ronîkirina bîr û baweriya netewe ya li ser hemwelatîyan ve mimkûn e.¹

Nûyitî û bûna zindewar bi gelemperî di sistemeke dîrokê re derbas dibe, ya ku di hundirê kodeke hafîzayê de însa bûye. Madem bê hafîze û dîrok netewe nikare çêbibe û jixwe vanan meşrûiyeteke polîtîk jî dabîn dike, dewleta ku em behsa wê dikin, şensê wê yî ku wek mewcûdiyeteke zindî xuya neke qet tuneye. Bi rastî jî însaya civakê ya ku divê xwe bispêre netewe dewletê, elbet ji bo wê hin parametre lazîm in, mînak divê xwe bispêre mewcûdiyeta dîrokeke bi nav û deng, bav û kalên mêrxas û destanên şewqdar.

Bîngêkirina rabirdûyê wek hêzeke zindî yan jî wek cewherekî ku tu carî wenda nebûye, heta karê tazîkirina rabirdûya ku ji eslê xwe yî zanistî û xistina wê yî fanoseke çêkirî, peywira herî mezin a dîroknasê ku aîdî neteweya di rewşa însayê de. Destnîşankirina Walter Benjamin pirr rast e. Li gorî Benjamin, wek ku di navbera me û nîfşên berê de peymanek hebe hertim tê xuyakirin:

“Ev ji bo hêmaya rabirdûya ku mijara dîrokê ye jî wiha ye. Rabirdû, pêristeke veşartî ya deme dihewîne; ev e ya ku deriyê rizgariyê jê re vedike. Ma li me naxe û ji me derbas nabe qey bayê ku yên berê dorpêç kiribû? Ma wê olan nede dengê kesên ku êdî nema deng dikin ji dengên ku em guhên xwe didin wan? Jinên ku me pesnên wan kirine gelo xwehên wan ên

¹ Ev dunirxî (ambivalent) ji teref Homi K. Babha ve bi awayekî tetmînkâr hatiye ravekirin. (Babha 1990, 1) Em bînin bîra xwe, Tom Nairn jî nêzikî vê hêmayê, netewperwerî şibandibû janusa cot-rû.

ku nasnekirî çênebûne? Dema ku wiha be, ev tê wê wateya ku di navbera me û nifşên berê de peymaneke nepenî heye. Li vê dinyayê li bende me bûn. Wek her nifşên berê em jî bi hêzeke lawaz a Mesîyanîk hatine xemilandin, hêzeke ku rabirdû di wê de doza mafê xwe dike... Ne hêsan e ku mirov bersiva vê îdîayê bide..” (Benjamin 2000, 40)

Dema dîroknasên neteweyê zend û bendên xwe hildan ji bo neqilkirinê di navbera nifşan de, mecbûr in şopa yê ku berê hiştine vesaz bike û dest bi kar bike. Elbet her ‘vesazkirina ji nû de’ hin niyet û pêşnûmayan di xwe de vedihewîne. Ji bo tilsimê ku pêşkêşî asoya netewe tê kirin, bi ruh û can bibe, encax bi veguhestina potansiyela baweriyeke xurt mimkun e.

1.3. Netewe û Înşa

P.J. Geary di kitêba xwe yê *Uluslar Miti ve Avrupa Kimliği* de ji mînakên Rojhilat û Ewrûpaya Navîn dikeve rê û dibêje neteweyê (ku mîtek e yan jî vebêjek e) di sê merhaleyan de tê avakirin:

“Wek vegotîneke tîpîk îdelojîya neteweperwerî, çawa pêşîya tevgerên xweseriyê bi taybetî di Ewrûpaya Rojhilat û Navîn de vekirîye, sê qonaxan ferz dike di vê pêvajoya afirîneriya civaka texeyulkirî de. Di qonaxa yekem de vekolana ziman, çand û dîroka gelekî dabestî (tabîî) ji teref komeke rewşenbîrên hişyar; di qonaxa duyem, neqilkirina fikrên van lêkolîneran ji teref komeke welatparêz, ji bo ku belav bibe di nava gel de û di qonaxa dawî de tevgera neteweyî digihêje lutkeya girseyî.” (Geary 2017, 27)

Loma formulasyona rabirdûyê û bikaranîna rabirdûyê wek vegotîneke mezin a di rewşeke ruşeymî tê heman wateyê. Wek ku Geary neqil kiribû dikare bê bîrê, ew mînaka afirandina neteweyên nû, yê ku bi rabirdûya Serdema Navîn a dût ve

hatibû têkildarkirin ji teref rewşenbîr û siyasemedarên di bin bandora şoreş û romantîzma di sedsala 19 an de.²

1.4.Mît û Dîrok

Mircea Eliade di *Kutsal ve Kutsal-Dışı Dinin Doğası* de têkiliya di navbera mît û baweriyê de wiha formule dika: “Mît ku carekê hat gotin, yanî piştî ku hat îfşakirin bê nîqaş dikeve dirûvê heqîqetekê.” (Eliade 2017, 86) Em dikarin vê yekê wek qebiliyeta ku veguheriya heqîqetê jî bixwînin û qebûl bikin ku ev yek carekê hat avakirin (creaation of myth), yanî ku pêşkeşî asoya neteweyê bû. Berê, di sedsala 19 an a kelepura zanistê de, wê dijberî zagona xwezayê bûya ku mîtên -ku ‘objeyên baweriyê’ bûn- li wan nehatana pirsîn û li wan hûr nehataya nerîn. Nerîta Kartezyen mît veguherandibû ‘objeya şîroveyê’ û dest bi kar kiribû. Lakin wek gelek teorisyenên ku li dewsa ew mîtên kevn êdî fikra neteweperwerî fam dikirin, mîteke mezintir, wê mîta neteweyê cih bigirta.

Ji bo ku mirov mîtekê ber bi hişekî aqilmend ve bilind bike, yan jî bi îfadeyeke sade vê mîtê têxe mantixeke ku gel bi hêsanî jê bawer bike, rîtûelên ku felsefeya vê mîtê zindî dihêle û bibîr tîne divê gelek caran bèn dubarekirin. Bê îstîsna di her mekanîzmeya neteweperwer de salveger, merasim û bibîranîn di nava pergala dúbarekirinê de xizmetê dikin ji bo ku ew mît rasyonelîze bibe. Şablona ku pispor jê re dibêjin “perwerdeya dubare” bergeha meşrûiyet û sembolîk tîne meydanê.

Bêguman girîngiya mîtan gelekî mezin e ji bo ku dîrok bê şîrovekirin û bibe tasawîreke dahatûyê. Ji bo formasyona îdeolojîk a civakekê bav û kal, nijad û serfiraziyên dîrokî pêwistiyên wê yî mutleq henin Li vir wê pîrr bi fêde be nerîna pêyvên Dr. Shahab Vali, yên ku derbarê xwezaya têkiliyên di navbera dîrok û mîtan de gotibû:

“Têkiliya mît û dîrokê jî mijareke girîng e ku divê mirov li ser bisekine. Lewre mît bi heman şiklî dîroka

² Li aliyê Kurdan, ev dişibe wek tiştên ku Xelîl Xeyalî di *Jînê* de nivîsandiyê: Rewşa qewmên ku feyz ji dîroka ku xezîneyeke dewlemend e nestendine wê tu carî nebaş bûya. Îlhama ku ji dîroka netewî tê stendin wê bibe avêtina gavekê di dahatûya netewî de. Bnr. (Bitlîsî 1335, 780)

milet in. Behsa dewreke zêrîn a miletekî dikin. Ji meta-dîroka wan, behsa afirandina wan a ku berî dîrokê qewimiye, behsa bavên wan ên hevpar, behsa mêrxasên wan ên bê qusûr, behsa welatê wan ê îdeal ê berî dîrokê, behsa xelasbûna wan a dahatûyê û derketina wan a ji nû veya lûtkeyê û dewrên zêrîn ên ku wê pêk werin dikin. Yanî ji aliyekî ve mît, pevgerîdanekê di navbera do-îro-sibeha miletekî de çêdike û hêvî, şanazî, xwe-mezinkirin û jixwebawriyê dide wan. Di vê çarçoveyê de em şahid in ku mît di nivîsîna dîroka fermî de çawa tîn enstrumantalîzekirin. Di nivîsandina dîroka fermî de ya gelek welat û milletên cihêreng de gengaz e ku mirov bibîne bê çawa efsane esas tîn girtin û rolê dilîzin. Riwayetên ku elaqeya wan bi rastiya dîrokê tune, di nivîsandina dîroka fermî de tê bikaranîn, dikeve rewşa îdeolojiyeke ku bê qebûlkirin, meşrûdibe û li ser hafîzeyeke hevpar rûdinê. Piştî vê merhaleyê, êdî guhertin an jî serastkirina wê ya bi riya aqil û mantiqê ne gengaz e. Lêbelê wek ku Cassirer jî gotiye, dema ku aqil û dîrok li hember mîtan derdikevin ên ku qezenc dikin her tim mît in. Lewre mît efsaneya herî îdeal e.” (Vali 2019, 8)

1.5.Mît û Vegotin

Îro li gorî pênaseyê, mît di dinyayeke pre-lojîk de şêwe girtine û bê nîqaş ji teref insanên berê hatine hilberîn, ên ku hewl didan ku ji kaosê re derbirînekê yan jî çareseriyeyeke bibîne. Herçiqas ji hêla ampîrîstan ve mît bi awayekî rasyonel û cidî divê naye qebûlkirin jî siyasetmedarê neteweperwer nikarin veşêrin şaşwazî û mineta xwe li hember rola wan a hilberîna bawerî û meşrûiyetê. Eger ku komek an jî civakek bi riya mîtan dikare bê çêkîrin, bi heman rêbazê rastiyan wek nirxên hevpar, berdewamî, ruhê nerîte û hwd. jî dikare têkevin hişmendiya girseya armanckirî. Yanî

li vir ‘yekbûna netewî’ kodeke siyasetê ye ku her tim bi kêr tê. Hetta yekbûna netewî ewqasî tê berzkirin, rîskên ku wê zirarê bidin neteweyên din jî dibin hêmanên pesindayîne.

Gregory Jusdanis baldikişîne ku hin metn ji bo ku vegotîneke neteweyî bê avakirin ji yên din baştir in:

Metn ji bo armançeke xuya ya balkêş in ya baş in an jî nebaş in.; hin metn ji bo avakirina kilîseyê, xurtkirina paradîgmeyeke felsefî yan jî ji bo honandina vegotîneke neteweyî ji yên din baştir in.
(Jusdanis 2015, 92)

Jusdanis mînakeke pirr baş dide. Dema ku kilîse Mesihîti saz kir û *Ahîta Nû* anî meydanê, metnên gnostîk hatin tesfîyekirin. Bûyereke bi vî rengî di Yewnana Antîk de jî qewimiye. Berhemên Platon giş mane heya roja îro lê ji metnên dijminên wî yên Sofîstan çend perçeyên biçûk mane.

1.6. Rabêja yê Din

Bêguman mezinbûna miletekî, ji bo îfadeyêke din firehkirina erda xwe, tê maneya ji holê rakirina hin miletên din. Tê zanîn ku derketina netewe-dewletên sedsala 20 an bi kuştina milyonan însanan netîce bûye. Piştî Şerê Cîhanê yê yekem, Lenîn yan jî Wilson ku serokên du dewletên gelekî hêzdar ên sedsala 20 an bûn, damezrandina netewe-dewletan, ji bo gelî teşwîq kirin. Ku em li helwesta wan bifikirin wê mesele baştir bê fêhmkirin. Înşaya mîten ku gihiştine serkeftiyê mirov dikare mîna çî alayên ku di sedsala 20 an de li ber avahiya Neteweyên Yekbûyî li ba dibe jî bibîne

Mark Edmundson di *Freud'un Son Yıllarında* de taybetmendiyêke ku di derheqê Cihûyan de daye bi mijara me ve gelekî girêdayî ye. Li gorî Freud ên Cihû êdî hinî dijminatîyê bûne û ev yek kirine parçeyek ji mîrasa xwe. Hinbûna dijminatîyê û qebûlkirina wê ya wek mîrasekê... Yekem car ev îfade zêde bi pîrsgirêkê tê xuyakirin. Belê damezrînerê psîkanalîzê bi rastî eşkere dike ku mîteke netewî çawa tê bi kar anîn. (Edmundson 2009, 30)

John Gray bi awayekî îronîk dibêje ku rûpelên dîrokê bi mînakên rejîmên hilweşiyayî tijî ne, ji yê ku ji bo dabînkirina baweriya tehdîdan şer bi ser neketinin: “ Îmkana organîzasyona cengê ji bo civakeke, di heman demê de tê wateya dabînkirina îstiqrareke polîtîk jî. (Gray 2017, 74)”

Vê hêmana heyatî ya di dijmin de bi îfadeya *perpetuum mobile*, di rabêja William Schmid de wateyeke bê qisûr qezenç kiriye:

Mekîneya ku serkeftinên saxlem hildiberîne. Dibe rû bide mirovekî xwedî dijmin, dibe ku ruh bide wî, dibe ku enerjî û jiyaneke nû bexşî bike. Ku mirov wiha bê motîvekirin, wê dabîn bike ku bikêr bimîne egoya wî ya ku her tim li ser dişixule. Êdî qeneatê nîne bi hebûneke acizker... (Schmid 2017, 16)

Gelek watedar e ya ku sernavê Umberto Eco ji bo kitêba xwe hilibijartiyê. Di kitêba xwe ya bi navê *Düşman Yaratmak* de Eco dema ku di nava dîrokê de tezahirên hêmayên dijmin pêşkêş dîke di cîyekî de jêgirtinekê balkêş ji çapa 1798 an, a *Encyclopedia Britannicayê* distîne:

Tê dîtî ku rengên xwîna zencîyan de tonên cihêreng hene: Lêbelê giş bi xetên rûyên xwe ji mirovên din cuda ne. Taybetmendiyên sereke yê şiklên wan ên nexweşik û xwar wiha ne: Gepên wan gilover, hestiyên hinarikên wan derketî, eniyên hinekî bilind, bêvileke kin, pan û fireh. Bi heman şiklî lêvên wan qalind û guhên wan piçûk in. Navzikên jinên zencîyan gelekî daketî ne û kemaxên wan ên pîrr pan dişibin zînan. Mirov dikare tebîetên vî nijadê bêşens wiha rêz

bike: Tiralî, îxanet, heyfhilanîn, zalimtî, dizî, derewgotin, mustehcenî û kêfdarî ye. Tê gotin ku bêpîvanî, hêmanên zagonên xwezayê tunne kiriye û wijdan û azarên wan bêdeng hiştiye. Zencî bi temamî ji hestên dilovaniyê bêpar in. Dema ku mirov tenê dimînin çawa ji rê derdikevin? Zencî ji bo vê pirsê mînakên tirsnaq in. (Eco 2014, 18-19)

Bi qasî ku em liv ir fam dikin em li hemberî hêmayeke neyînî sekinîne, ya nasnameya zencî yên ku ji bo netewe wek tehdît tê dîtîn. Helbet ev metn bi nerîna mirovên çermspî û bi pênuşa wan hatiye nivîsandin. Ji ber vê yekê em ne li bende ne ku mirovên çermspî yên xwedî otorîte û zagonan çêdikin ji zenciyan re xweş bikin. Lê belê helwesteke pir dubarekirî heye li vir: Ji bo ku nijadekê pêname bike dê rabin ji çend hurgiliyên fîzyolojîk tevbigere. Belkî bi temamî cihê wê ye ku em bibêjin: Hikmeta bingehîn a nijadên Arî ku çermspî, zerî, û çavşîn tên hesibandin di vir de vaşartiye.

Jan Assman di kitêba xwe ya bi navê *Mısırlı Musa* de li gor nerîna Îsraîliyan neqil dike ku Misir temsîla tarîti û putperestiyê ye. Di heman demê de ilawe dike ku nîşana yek-Xwedayî ye, rola ku Mûsa li hember Misirê dilîze:

Yek-Xwedayîtiyê wek olekî dijber pêname dike. Lê cudabûna wî ne ji ber vê yekê ye. Aliyê wî yê cihê yê divê ku em nas bikin ew e ku bi awayakî teqez ji baweriyên kevneşopî vediqete. Bi awayekî tîpîk, nerîte wek rîtûelên efsûnî, sentezeke fetîşîzma baweriyên pûç û putperestiyê dibîne. Ev ji gelek aliyên ve li gor pênameya nûjen hîn baştir, wek têgeheke yek-Xwedayî tê xuyakirin. Pênameya nûjen li ser pirsên teolojîk yên derheqê tekîti û piraniyê disekine. Yên berê li ser rîtûel, qurban, peyker û perestgeh, ferman û wek tabû, yanî li ser aliyên

pragmatîk ên din disekinin;- ji bilî meseleyên teolojîk, yên wek têgehkirina tiştê îlahî. Dijberiya pûtan û perçekirina îkonan (peristeyan) taybetmendiyan diyarker ên bizavên yek-Xwedayî bûn. Baweriyên ku li hember ‘nerazîtiya’ nerîtê derketibûn holê, ew bûn. (Assmann 2016, 64)

Dîsa li gorî Assman, Îsraîl heqîqetê, Misir tarîfî û xeletiyê simbolîze dike. Bi vî şiklî Misir rasteqîniya xwe ya dîrokî wenda dike û vediguhere hêmaya negatîv a Îsraîlê. Îsraîl înkara Misirê ye û hebûna Misir temsîla her tiştên ku Îsraîl têk biriyê. Me re dikare vegotina *Derketinê / Exodus* ya di Tewratê de wek negatîvkirina nasnameya Misirê jî bixwîne. Di vir de ol û netewe tevlihev dibin.

Semîyolojiya resenetiya nasnameya Îsraîl gelo wê çawa bê famkirin? Redkirina temsîlên aîdî yên din û çêkirina zagonên dijber³: Ev ew tiştê ku Assman jê re dibêje: ‘prensîba bermeqlûbkirî ya normatîv.’ Mînakek derengtirî wê demê dide Assman. Piştî mirina Mîrê Misirê Akheneton ê yek-Xwedayî, navê wî ji nav lîsteya qiralan hatiye derxistin, peykerên wî hatine perçekirin û abîde û teswîrên wî hatine tunekirin. Mînakên wiha dikare bîna zêdekirin. Tedbîqkirinên bi vî rengî derbarê xwezaya desthilatdarî û nasnameyê fikrên çawa didin?

Di baweriyê Georges Corm de ji bo ku mîtek berdewam bimîne bêgûman dijminek lazim e. Corm, nasnameya Rojava bi yên din re yan jî ya rast bi hêmaya dijmin re bi têgeha ‘qonsepta reqabetê’ ve wiha îfade dike:

³ Jixwe ev tema bi her awayî beynelmîlê e: Ji bo Yewnana Qedîm ‘yê din’, barbar bû. Hetta Herodotos di *Dîrokê* de şaristaniyê, wek şerê di navbera Grek û Barbaran de dinirxîne. Piştî Şoreşa Frensayê, yên komarparêz xwestin ku dîrokeke nû însa bikin. Heft rojên heftiyê derxistin deh rojan û salnameyê komarparêz avakirin. Ji bi agahiyên berfireh bnr: (Ciavatta 2016, 137-170)

Ev têgeh di roja me de wek hêzeke bêmanend, şaristanî, pêşketin, zanista ku ji serfiraziyan têr nabe, aqilmendî, modernîte, takekesîfî, dewleta hiqûqê, mafên mirovan, milletên yekbûyî, fetha fezayê, azadiya jinan, mafên zarokan, azadî, xweşî, wekheviya firsetan, şerrê ku li hember nexweşî, birçîtî û hetta xizaniyê tê fêhmkirin. Yê bi serketî ye Rojava, yê ku fetih kiriye Rojava, yê ku dike rojavayî (westernize) dîsa Rojava ye. Tu peyv heta niha wiha nebûbû xwediyê bibîrxistinên hestiyar û sembolî. Ev referans giştî bi antîtezên xwe, yanî bi awayekî dijberî referansên ‘Rojhilat’ ve hatiye avakirin. (Corm 2011, 44-45)

2. MÎTA ARÎ DI ASOYA EWRUPA DE

Bêguman şemla mîta Arî, îdfayên wê yên belavker û mesîyanîk, piştî ku Elmanyaya Naziyan di Şerê Cîhanê yê Duyem de têk çû, bi gelemperî vemirî. Îdeolojiya Arî, ya ku di hundirê nerîta romantîk û îdealîst a Elman de ji aliyê kesên wek Herder, Schlegel, Schopenhauer û Nietzsche hatibû firehkirin, di nav destên Hîtler de veguhezî wek xewna rizgariya navnetewî. Di cotmeha sala 1944 an de piştî ku şer qediyabû di kovara *The Scientific Monthly* de Knight Dunlap gotarekê bi navê “Mîta Arî ya Mezin” nivîsibû. Bi hevokên Dunlap jêgirtinek wê baş be:

Bi awayekî berbelav, mîta Arî vê îdfayê pêşkeş dike. Beriya Mesîhîtiyê yên bi navê Arî erişî Hindistanê kiribûn û li geliya Îndusê bi cih bûbûn. Di derbarê welatên Ariyan de ev teoriya spekulatîv ji teref lêkolînerên ku bi sadeyî jê bawerkiribûn hatibû dahênandin. Ligel vey, kok dixwaze bila Ewropa yan jî Asya be, ev teorî bi giştî qebûl dike ku mewcûdên

Arî, koçî hundirê Hindistan, Îran û Ewropa kiribûn.
(Dunlap 1944, 297)

2.1. Peyva Arî

Peyva ‘arya’ di çavkaniyan de wek rengderekî neteweyî di nivîstekên Ahameniş de derbas dibe û xwe dispêre nerîta Avestaya Zerdeştîyê. Bikaranîna navê neteweyê wek ‘arya’ tê wateya endamên Avestayî ku miqabilên wê bi rêzê, ‘Tûirya, Sairima, Dâha, Sâinu or Sâini’ ne. Herwekî din di nerîta textên *Veda* û piştrî wê de wek ‘arya-, aryâ-, aryà’ xuyane. Mînak ‘arya’ bi wateya ‘birûmet’ û ‘yê esîl’ di van textan de derdikeve pêşiya me ku di wateya wê jî ‘dasa’ tê wateya ‘xûlam’ û ‘belengaz’. (<http://www.iranicaonline.org> 2015) Gürdal Aksoy balkdikişîne hemwateyê wê ‘krişna’ ku di kurdî tê wateya ‘cotkar’. Aksoy dibêje miqabilê wê di Sumerî de ‘arjara’ ye, ku tê wateya ‘halet’. Loma peyv ji aliye semantîkê ve di famîlyaya zîraet û çandê de bi cih dibe. (Aksoy 1991, 148) Lê ji me re ya girîng ew e ku çawa ketiye nava niqaşên filolojî, etnoloji û antropolojîyê.

Yek ji ên ku mîta Arî pêşxistibû û populer kiribû di sedsala 19 an de pisporê Hindê, filolog, helbestvan û feylesof Karl Wilhelm Friedrich Schlegel bû. Leon Poliakov wiha behsa Schlegel dike:

Ji bo Pers û Medan bi nav bike ji teref Anquetil du Peyron ku ji Herodotos nekilkiribû ev têrma Arî bi heman wateyê wek çendîn nivîskarên Elmanî jî hatibû bi kar anîn. Ji 1819 an pê ve bi saya Schlegel mezintiyê belavtir qezenç kir. Schlegel vê hîlbijartina xwe, koka Arî bi peyva *Ehre*, ya di Elmanî de dihat wateya rûmetê re têkildar kiribû da ku mafdar bê dîtin (nêzikî van wateyên heman kok di zimanê Keltî û Slavî jî derbas dibe, ji ber vê yekê ji aliye rêzîmanê bêgûman mafdar bû.) (Poliakov 2001, 242)

Referansa Keltî di pirtûka Siraç Bilgin a bi navê *Zarathuștra* de em li rast tèn. Bi ya Bilgin bi îhtimaleke mezin, peyva Arî (Bilgin dibêje ‘aryan’) di dîrokê de beriya ‘dabeşbûna mezin’ û yekem car di Keltî ji bo binavkirina van qewman (yên Arî) hatiye bi kar anîn: “Belê di demên dawî de nîşan bi giştî zimanên ku di nîvgirava Hindê de tê bikaranîn rê didin. Peyva Îran, bi wateya ‘welatê Ariyan’ dihat bi kar anîn, bi demê re forma xwe yî dawîn girtiye.” (Bilgin 2003, 21)

‘Berpîrsiyarê bikaranîna peyva Arî’ Max Muller di heman deme de pisporê Sanskrîtî bû û herçiqas Elman bû jî ji ber ku bi salan li Brîtanya hindekarî kiribû ‘peyva Arî’ bêtir li Frensa û Brîtanya hewl da bû ku di lîterature de bi cih bike. (Poliakov 2001, 249)

Helbet di vê sedsalê de çend tîrmên din jî wek alternatîvan hebûn. Hind-Cermen, Hind-Ewropî, Yafesî, Sanskrîtîk hwd. (Poliakov 2001, 249) Lakin Gordon Childe di peyva ‘Arî’ de bi îsrar e: “Ji aliyekî din ve peyva Arî ji ber ku xwerû û nasyar e avantajek wê jî heye. Ji ber vê yeke wek lihevkiirî di wateya nerîtî de ez parastinê vê tîrmê pêşniyaz dikim.” (Childe 2018, 12) Yanî gava ku em li ser vê meseleya Arî bifikirin çend parametreyên wek nijad, çand û bi taybetî jî ziman divê di bîra me de be. Mînak demekê li Ewropa peyva Hind-Germen bûbû moda. Belê Franz Bopp ji vê monopoliya ‘Germen’ zedê aciz bû:

Gava ku ji bo malbateke wiha berfireh bê bikaranîn ji bo çir mîna endamên gelen parzemîna me bi giştî wê yên Germen bê pêjirandin ez fam nakim. Ji ber vê yekê ez îbareya Hind-Germenî tesdîq nakim. Aniha bo ku bêtir bê famkirin wek kêliyekê ku li Frensayê û Brîtanyayê bikaranîna wê hatiye tesdîqkirin ez ê peyva Hind-Ewropa bi kar bînim. (Olender 1998, 28)

Helbet di van nîqaşan de, yê ku xuyaye ne tenê pîrsgirêkên etnolojiye û zimannasiyê bûn. Hêdî hêdî mesele ber bi reqabet û raseriya nav gel û netewan, heta

şaristaniyan ve diçû. Di paşê de em di argumanên Renan û Dumezil de bêtir bibîn, du xalên dijberî dikeve navenda pirsgerêkê: Dijberiya Samî û yên Arî. Erê herçiqas niqaş bi kişfên filolojiyê dest pê kir belê hîn sedsal di ser re neçû, mîta Arî veguhezî reqabeteke siyasî û îdeolojîk.

Weku Maurice Olender di pirtûka *Cennetin Dilleri* de baldikişîne, tu têgeh mîna Arî û Samî nebûye mijara pirsgeken jêdara mirovahiyê. Demekê dirêj ji bo ravekirina ontolojiya mirovahî (bi taybetî bi referansên Tewratê) nerîta Samî besî asoya Ewropa bû. Di paşê de bêtir zelal dibe ku prestîj û meyla Arî bi saya filolojiyê her ku çu xurtir bû û evdalên vê meylê ji dîlkêşiya filolojiyê yexa xwe qet rizgar nekirin.

2.2. Nerîta Yafesî

Mîta Arî herçiqas di sedsala 19 an de hate damêzrandin lakin mirov ji niqaşan ve dikare şopa koka mîtê heta *Pirtûka Pîroz* jî biajo. Li gorî senifandineke Serdema Navîn ya di Ewropa de, sê lawên Nûh Pêxember hebûn, yên bi navên Sam, Ham û Yafes. Piştî tofanê Nûh her sê lawên şandine ku li ser rûyê dinyeyê belavbibin da ku jiyana duyemîn saz bikin. Ku em senifandinê bişopînin, ewçax em bibînin ku Ham li Efrîqa, Sam li Asya û Yafes jî li Evropa bi cîh bûye.

TABLOYA LI GORÎ SENIFANDÎNA SERDEMA NAVÎN

Lawên Nûh	Herem	Sinif
-----------	-------	-------

Sam	Asya	Yên Rahîb
Ham	Efrîqa	Yên Xûlam
Yafes	Ewropa	Yên Esîl

(Çavkanî: Stefan Arvidsson, *Arî Îdols, Îndo-Europen Mythology as Îdelogy an Science*)

Wek ku di tabloyê de jî tê dîtin, birêvebirina temamê dinyayê, serastkirina gerdûnê û temsîlkirina maneya dawî ya dîrokê di destê şecereya Yafes de ye.⁴ Pêjirandina fikra ku Yafes û nijada wî bi temamî baş û serdest e, dawiya dawî wê veguherî cewherê tekane ya fikra Arî.

Ömer Faruk Harman di *Ansiklopediya Diyanetê* de 7 lawên Yafes dijmire: Gomer, Magog, Maday, Yavan, Tubal, Meşek û Tiras. Faruk wiha neqil dike:

Zarokên Yafes li ‘giravên gelan’, yanî li Anatolê, Peravên Deryaya Spî, rojava û bakûrê Îsrailê û li erdnigariya Egeyê bi cih bûne. Li gorî riwayatên Cihûyan Nûh rûyê erdê di nava lawên xwe de parve kiribû. Para Yafes çil memleket, sî û sê girav û bîst û du ziman û pênc cûreyên nivîsê ketibû. Ji ber hevşîbiya navan di nava Yafes û Japetus, yê ku mîtologyaya Grekî de têkîlî hatibû dayîn û îdfaya ku Yafes di eslê xwe de Japatusê Titan e. Bi sedema lawê

⁴ Nezikî vê mîta olî-îdeolojîk, mînaka *manifest destiny* a sedsala 19 an de ku yên Emerîkî di bo meşrûyeta siyaseta xwe emperyal dabîn bikin, mumkin e u em bibînin. (Kona 2015, 12)

wî Prometheus li gorî mîtologyaya Yewnanî Japatus
kalkê mirovahiyê ye. (Harman 2019)

Leon Poliakov di pirtûka *Ari Miti Avrupa'da Irkçı ve Milliyetçi Fikirlerin Tarihi* de neviyên Yafes wiha hatine pêşkeşkirin: Yên Qereçî, Elmanî, Kurdî, Spanî, Ermenî, Abhazayî, Tirk, Lihtenştaynî Frensî, Çînî, Hindî, Zazayî, Boşnakî, Çerkezî, Sirpî, Efganî, Lazî, Rûsî, Arnawûdî, Yewnanî, Adbadî, Îtalyayî, Macarî, Gurcî, Farsî, Pomakî, Îngilîzî û Talîşî. (Poliakov 2001, 21)

Poliakov di têgiştina Ewropa de bê çawa Yafes bûye hêmaya raseriyê di ser mînaka Elmanya ve de wiha rave dike: Li gorî Elmanan piştî ku tofan qediya Yafes li Elmanya bi cih bû û ji Îskenderê Mezin heta Tîmurlenk, şecereya împatoriya ku hemû fatîhên dîroka dinyeyê hilberandiye ew însa kir. (Poliakov 2001, 103) Poliakov nîşêyeke balkêş dide bê Luther çawa referans dabû koka Elmanan:

Bittabî, Luther hewl da ku vê ya bi çîroka Afirandinê rave bike. Di çîrozkasiya xwe de zîncîra şecereya Yafes-Aşkenaz hilbijartibû û ji ber ku Aşkenaz yê Gomer, Gomer jî lawê herî mezin ê Yafes bû, seba welidindina ewil ji vir gihîştibû encama îmtiyaza gelê xwe. (Poliakov 2001, 111)

Êdî di dema ronesansê de referansa Yafes ji di Ewropa de bû şecereyeke hevpar:

Veqetandina fikra neteweyê ji mefhûma mirovahiyê bi temamî di vê heyamê de bû. Ji hêla feylesof û

teologan ve gava ku navê Yafes, yê kalkê Ewropa yê hevpar derbas dibû, silavdayînek bes bû. Bossuet gava dinivîsand ku ‘piraniya gelên Rojavayî ji şecereya Yafes tê’, ewçax Pascal jî îlan dikir ku ‘ilma nesebê bi Yafes ve destpêdike.’ (Poliakov 2001, 35)

Em dibînin mîta Arî di vê qonaxê de bi riya nerîta *Pirtûka Pîroz* tê kemilandin û wek rabêjeke etnolojîk li asoya Ewropa belav dibe. Bi bandora nasnameya Yafes ve mît xwe di nava nerîteke xurt ku derbasî çarçoveyeke gelemperî dît. Heta di cihekî de dîroknasê tirk İsmail Hami Danişmend destnîşan dike ku di heman demê de navekî Yafes, ‘yê din’ ‘Arya’ bû. (Aksoy 1991, 41)

2.3. Teoriya Koçê

Li gorî vê teoriyê di milenyûma 2 emîn an de ên ku xwe bi navê Aryan qebûl dikirin ji bakûr ve pêl bi pêl koç kirin hundirê Îranê. Herçiqaş kişfên arkeolojîk û lêkolînên genetik tu carî vê teoriyê piştrast nake jî, di sedsala 19 an de teoriya koçê mîna doneyeke zanistî hatibû îlankirin. Piştî têgeha Aryan sînorê Îranê derbas kir û li parzemîna Ewropa, mînak li Brîtanya û Elmanya jî xwe bi cih kir. Li Frensayê dîroknasê mezin Michelet di wê baweriyaya ku mirovahî li Hindîstanê derketiye ser rûyê erdê:

Li koçên mirovahiyê temaşa bikin. Koçên riya ku rojê dişopîne û ber bi hêla birha manyetîka dinyê ve. Ji Esya ber bi Ewropa e. Temaşa bikin riya dirêj ya ku ji

Hindistan ve ber bi Frensayê. Xala destpêkê, cihê malzaroka dinyê Hindîstan⁵ bû. (Poliakov 2001, 250)

2.4. Raseriya Neteweyê

Li gorî têgihîştina Romayê yê Germa bi tevahî barbar û dûrî şaristaniyê bûn. Belê wer xuyaye piştî jîholêrabûna Romayê di wateya vî navî de guhertinên erênî çêbûbû. Ji ber ku ronensansê fikra gelparêzî û netewperwerî bi xwe re anî, endamên gelên Germa jî xwe ji nû ve kişfikirin û qîmetê mezin dan koka xwe yî berê. Di dîrokê de em dibînin ku her netew teqez bi malbateke diyar xwe pênase dike û bi vê rewşê şanaz dibe.

Yûnanî bi navê Helen, Roma bi navê Troya, Îspanyolî bi navê Got, Frensevî bi navê Frank serbilindiya xwe tînin zimên. Binavkirina bi vî hawî ji aliyekî ve bi riya dîrokê û wekî din jî bi amûrên mîna genetîkê wek bi ‘helwesteke zanistî’ tevdigere. Ev binavkirin ji hêlekê nasnameyekê jî çêdike û li hember netewên din meşruîyetekê jî dabîn dike. Tiştêkî girîngtir heye ku nasname di dîrokê de geh bi guhertinên hêzê, geh bi fikrên nuh ji xwe re helwesteke dînamîk însa dike. Weku Polakov jî bixêz dike, li Ewropa di destpêka sedsala 17 an de navên Latinî-Mesîhî cihê xwe ji navên kokê Cermen re hiştin. (Poliakov 2001, 29)

⁵ Di dîroka kurdan de meseleya koçê ji aliye Medya ve hatiye niqaşkirin. Yê Medî ji teref gelek dîroknasan wek proto kurd tînin hesibandin û daxilî nav gelên Arî dibin. “Di milenyûma 3 an a B.Z. de ji rojavyê Bakur ê Îranê koçkirin û li derdora Zagrosê bi cih bûn. Tê zanin ku di sedsala 7 an a B.Z. gihîştin lutkeya hêza xwe û li hember Dewleta Asurî şer kirin. Asurî ji teref wan hatê têkbirin û hilweşiya. Li Zagrosê çandeke bilind ava kirin û di heyama 150 salî de dîrokeke zêrîn bidestxistin. Di nava vê çanda bilind de oleke bi navê Mazdeîzmê li Medya derket holê û pêxemberê wê Zerdeştê vê olê belavkir di nava Medan de. Dîroknaseke kurd yan biyan çî demê li ser dîroka kevn a kurdan dest binivîse bike teqez divê behsa împatoriya Medya jî bike û weku kurdên proto balbikişîne.” (M. S. Bilgin 2003, 17-18)

Herderê ku parêzvanekî coşdar ê mîta Arî bû, kesê ku di navbera neteweya xwe û dîrokê de bixwaze hesteker romantîk bibîne xweş tarîf kiribû: “Lewra her netew dixwaze xwe weku yekem netewe bibîne û pir hez ji vê pejirandina ku welatê wan yekem car mirovahî lê çêbuye, dike.” (Olender 1998, 17) Elmanekî din, Goethe di gotûbêja bi Eckermann re de mekanîzmaya hesta raseriyê û meşrûiyeta bi olê ve ji hela felsefeya dîroknivîsiyê niqaş kiribû:

Nivîsên pîroz bi zimanekî mutleq dibêje Xwedê di roja şeşan de tenê cotek mirov afirandiye. Belê ên bi huner, ên ku peyva Xwedê wek nivîsê li ser kaxêzê danîn, cara ewil gelê n xwe yî hibijartî famkiribûn; û wek hatibû behskirin, ev gelên hatina wan ê bi rûmet, ya ji Adem û Hawa em niqaş nakin. Belê mîna ên Zencî, Laponî û yên ku ji me lewendtir em jî teqez xwedî kalkên cuda ne. (Poliakov 2001, 29)

Ku em romantîkekî Elman ê bi navê Ficthe bişopînin divê em ji bilî Slavan gelên Ewropa bi giştî tevlî şecereya Elmanan bikin. Belê di nava yên bi wendakirina ‘nijada resen’ (urwolk) û ‘zimanê resen’ (ursprache) kêmbere, ji Elmanî derketî û ‘gelê neo-Latînî’, yê ku xesandî de ferqek danî bû. Ficthe ji Elmanan re digot: “Heger ku hûn hilweşin, wê mirovahî jî hilweşe û tu hêviya rizgariyê êdî tune⁶.” (Poliakov 2001, 129)

Montesquieu di pesinandina nijada Elmanî de tu sînore qebûl nedikir: “Di mijara şerefê de gelên Elmanî bi hessasî ji me ne kêmtir bûn; heta ji me jî hessastir bûn. Ji ber ku kalikên me li hember biçûkxistinê pir hessas bûn.” (Poliakov 2001, 34)

⁶ Piştî sedsal din Hitler vê rabêjê wiha berdewam dikir: “Heger ku ew (Arî) bê mecbûrkirin da ku biçê wê tariyeke kesîf têkeve ser rûyê erdê û wê dinya veguhezî çolekê” (Poliakov 2001, 129) Di cihekî din de gotibû: “Arî Prometheusê mirovahî ye.” (Olender 1998, 12)

Poliakov referansekê dide Jean Paul ê ku di ‘Weaza Aştiyê Ji Bo Elmanya’ de wiha îdîa kiribû:

Herztberg bi alîmane destnîşan kiribû ku Germen in, yên ku qraliyetên Ewropa damêzrandibûn û wan şênî kiribûn. Û ji vê îdîayê mezintir encamek derxistibû: Şerên di nava mirovên hemû cihanê de (di eslê xwe de) di nava birayên heq de derbasbûye. (Poliakov 2001, 126)

Teraftarekî mîta Arî yê din Max Muller dema ku Frensa û Prusya ketibûn şerekî mezin 1871 an de ji Renan re gazine xwe dikir⁷:

Wek ku ez Elman im ez dizanim ku teqez hûn jî Frensiz in. Belê ez bawer dikim ku ev rewş nikare me ji vê hestan asteng bike, ya ev şerê ku texrîbat û hetîketî ji nijada me re aniye. Lazim em giş di nava êş û hetîketiyê de dest deynin ser rûyê xwe. (Poliakov 2001, 266)

2.5.Fîlolojiya Arî

Di sedsala 19 an de ‘hêmayeke hevpar’ bûbû wek qaîdeyê beynelmîlî: Ya di nava taybetiyên zimanan de û ên ku bi vî zimanê diyepivîn têkiliyê mutleq dihate

⁷ Max Muller di vê baweriyê de bû, ya ku him Frensa û him Prusya di çarçoveya Arî de hevalbendê hev bûn. Di vê hevokê de nerîna Muller eşkere ye jixwe: “Him bi hev re him jî bi nijadên Turanî û Samî re ketin micadeleya daîmî û neteweya Arî gihişt hikûmraniya dîrokê.” (Poliakov 2001, 266)

dîtin. Li gorî feylefosê navdar ê Fransiz Étienne Bonnot de Condillac taybetmendiyên zimanekî di derbarê karakterên gelê wî zimanî de agahiyên krîtîk didin. “Lewra her tişt, her zimên, taybetiyên gele ku wî zimanê dipevin tesdîq dike.” (Olender 1998, 19)

Ernest Renan ku taliyê wê bibe parêzvanê herî tund ê mîta Arî, têkiliya ku Condillac danîbû, bi awayekî cidî û zanistî pêşkêş kiribû. Herwiha di çekirin û mezinkirina mîta Arî de, ji William Jones bigire heta bigihêje Herder, Sclegel û Schapenhauer, keşf û pêşniyazên di qada filolojiyê de wek tesîrên mezin xuya dike. (Popkin 1975, 721)

Ji bo ku dîroka mîta Arî bi cih bikin pêwîst e em herin dawîya sedsala 18 an. 1783 an de William Jones, yê li Hindistana kolonyal a Îngilîzan wek wezîfeya dadgerê bilind hatibû tayînkirin, Sanskrîtiya zimanê ayînên pîroz ê Hindî gava analîz kiribû di navbera vî zimanî û zimanê Ewropî yê cûrbicûr nêzikatiyeke metelmayî kişf kiribû. Li gorî Jones di navbera Sanskrîtî û zimanê Ewropî de teqez divê têkiliya meriwantiyê hebûya. Li Kalkuta, wek damêzrînerê *The Asiatic Society* gava xîtabî endaman dikir, tespîtên dîrokî anîbû ziman:

Çiqasî kevn be jî ji Yewnanî mikemltir û ji Latinî dewlemeendtir, û ji herduyan zariftir û hejmetkartir binyadeke Sanskrîtî heye. Dîsa jî tê qebûlkirin ku di navbera her du zimanan de ji aliye kokên lêkera û qalibên rêzimanîyê ve dervî rashatinê hevşîbiya mezin heye. Di rastiyê de, ev wiha hevşîbiyeke ku filolog bawer neke ku di nava her sê zimanan de jêdera çavkaniyeke hevpar heye nikare lêkolîn bike. Belê êdî ev jêder nemaye. Herçiqas ne wek vê ya serkeftî be û bi zimanekî pir cuda li nav hevketî be jî di nevbara zimanê Gotî û Keltî de sedemek heye, ya ku bi

Sanskritî ve ji heman çavkaniyê hatine, heger vir cihê niqaşa pirsgirêkên têkildarî Îranê bi dema antîk re bû ya me dikarîbû Farisî jî ilawe bikira. (Olender 1998, 14)

Di hevpeyvîneke bi Didier Eribon re, Georges Dumezil vê agahiyê dide me, ya ku di sedsala 19 an de zimannasiya berawirdkirî û mîtolojiya berawirdkirî bê çawa di heman demê de weku cêwiyekê bi hev re welidîne. Di sedsala 19 an de weku Georges Dumezil jî dupat dike, zimannasî hêla gelek xebatên akademîk tayin kiribû. (Eribon 1987, 28)

Bi taybetî di mijara etîmolojiyê de ji cihekî pê ve hêdî hêdî meyleke necidî peyda bûbû. Helbet mîtolojî jî weku jokerekî her tim amade bû ku peywîrekê bi cih bîne. Mînak di zimanên du netewan de ji aliyê fonetîka peyvan nêzikahî dihate ditîn, di heman cihê de bi riya mîtolojiyê veya dihat pişt rastkirin.

Proses wiha dişuxilî: Heger di zimanekî de bo nimûne, peyva di Yunanî de *ambroziyayla* hebe, lêgerîna wê di zimanekî din destpêdikir. Peyva ‘ambroziyayla’ û ewçax di zimanên Hindî de miqabilî *amrita* ye ku her peyv jî tê wateya *ava heyatê*. Ê gelo bi vê prosesê em dikarin bihgihêjin merivantiya Hind û Yunaniyan. Di sedsala 19 an de bi vê riya (ku di literatûrê de eslê xwe de bi navê ‘etîmolojiya gel’ derbas dibe) weku Emile Benveniste jî gotibû, dîrok, antropoloji, mitolojî û zimannasî hatibû xala xetimandinê. Dumezil ji Eribon re dibêje, ji ber vê xetimandinê min di xebatên mitolojiyê de berê xwe da ‘fonksiyonên motîvên mîtolojiya dinyayê’. Georges Dumezil di serê kariyera xwe de di mîtologyaya ‘Hind-Ewropî’ de leheng û sîstemên hevpar koland û ew modela xwe yî navdar, ku em ê beşê piştîre bi hurgilî behs bikin, a bi navê ‘îdelojiya bi-sê fonksiyon’ însa kir û gav bi gav pêş de xist.

Beriya mîta Arî zimanê pîroz û yekem bêguman li Ewropeyê Îbranî bû. Zimanê Îbranî di *nerîta Mosaic*⁸ de zimanê Adem û Hewa li bexçeyê bihuştê û di tofanê de jî yê Nûh ê bavê duyem bû. Ziman bi giştî ji Îbranî der bûbûn ku bixwe di *Tewratê* de di beşa Babilîyan eşkere xuyabe. Lakin parêzvanên Mîta Arî ne di wê baweriyê de bûn.

⁸ Ev nerît, wek ‘nerîta semîtik’ tê naskirin. Ji bo xebateke baş di vê mijarê de bnr: (Winnett 1949)

Hîn di sedsala 12 an de hin Elman îdîa dikirin ku Adem u Hewa bi zimanê Elmanî dipeyivîn. (Poliakov 2001, 101) Di dawiyê de Luther jî bê hema di vê baweriyê de bû.⁹ Maurice Olender mînakeke der-sirûştî pêşkeş dike di *Cennetin Dilleri* de. Li gorî vê mînakê di sedsala 17 an de yekî navê Andreas Kempe bi navê *Zimanên Bihuştê* risaleyekê diweşîne. Xuyaye pirtûk çîroka bexçeyê bihuştê wek parodiyê ji nû ve dinivîsine. Di vê parodiyê mar vê carê bi peyvên Frensizî Hewa ji rê dibe. Bi ser de Adem bi zimanê Danmarkî û Xwedê jî bi Swedî dipeyive. (Olender 1998, 14)

2.6.Di Romantîkan de Mîta Arî

Papazekî Lutheryan Johann Gottfried von Herder nezikatiyên ku Jones kişf kiribû pêş de xist û li Ewropa kir doktrîneke hejmetkariya Hindê (Îndomania). Di nivîsên Herder de kêfxweşiyê hêmaya şaristaniya Hindê heye. Bawer dike ku bi welidîna şaristaniya Hindê ve gaveke pir krîtîk, ya ku di riya şaristanî û mikemeliyê de mirovahî avêtiye. Li gorî wî erda Hindê ji aliyê cihnişînê ve cihê herî ‘xweşik û bi bereket e li ser rûyê erdê’ ye:

Miqabilî hêmaya Ewropiyên ku hertim serxweş, derbeder û gemarî, Brahman gelên xwe bi şeweyê delal, lihevhatî û paqij perwerde kir. Yan jî bi kêmasî teqez e ku fezîletên wan ê bi vî rengî pêş de xistiye. Kiryar û zimanên wan zerîf û tabî ye. Têkiliyê wan aştîxwazane, laşên wan paqij, terza jiyana wan xwerû û jidil in. Zarok, di tebîeteke xweş û bi ser de ji ilmê behremend mezin bûne. Her çiqas hindik be jî ne kêman in pîşesaziyê û teqlîd be jî ne kêman in ji hunerê. Qebîleyên binî jî dikarin hinî xwendin, nivîs û hesabê bibe. Ji ber ku ev hezar sal perwedekarên ciwanan in,

⁹ “Ji ber ez Xwedayê xwe di zimanê Elmanî de dibihêzim ez şikir dikim, ne ez û ne hûn me nikarîbû wî di Latinî û Yewnanî de bidîta.” (Poliakov 2001, 111)

Brahman karekî bê-hempa ji mirovhiyê re kirine.
(Arvidsson 2006, 24)

Ne mimkun e ku mirov arezûyeke utopîk a di hevokên Herder de nebîne. Weku Arvidsson jî bibîr tîne, xweşikrêdana Hindê ya Herder û şopgerên wî, bi gelemperî bertekê bû ji bo fikra aqilmend a heyamê û bi heman rewşê xwesteka dûrketina ji gola xwînê ya Şoreşa Fransayê û ji dinyaya Şerên Napolyon. Li gor Arvidsson:

Yên romantîk yekane jiyanê di cebheyan gişan de di bin tehdîte de dîtin. Zanista mekanîk, antropolojiya materyalîst, polîtîkayên ku ji nerîte nefret dikirin, teolojiya ku hatiye herimandin û klasîzma bêtesîr hesteke biwecd bê îmkân hiştibû. Romantîkan xebatên xwe bi edebiyata Hindî, fikr û têgehên Bhagavat, Gita û Ūpanîşatan bingeh kirin. Ew, Hindên Qedîm di vê hêmayê de afirandin: Di temaşaya xwezaya rûhî ya dinyayê de, di heyberên wendabûyî de, di giyanên koçkirî de û di reenkarnasyonên Xwedayî, yê dubarekirî de. (Arvidsson 2006, 25)

Ew îdîaya ku Ernest Jones hîs kiribû, ya ku hemû zimanê Hînd-Ewrûpî ji kokeke Sanskrîtî hatiye ji teref Karl Wilhelm Friedrich Schlegel ve di pirtûka xwe yî bi navê *Über die Sprache und Weisheit der Indier* de, bi awayekî fireh hate kolandin. Schlegel, wek selefê xwe Herder difikirî ku ziman di pênaseya miletekî de roleke girîng dilîze. Herder, ziman wek ruhê gelekî didît, ev jî destnîşankirina wî ya sereke bû derheqê zimên de:

Yewnanî jî di nav de, zimanê Hindî bi temamî wek zimanekî felsefî û dînî hatiye pênasekirin. Ne di bin bandora kombînasyonên kêfî û guherbar ên

razberkirinê de (abstractions) ne. Lêbelê di nav sazûmaneke mayînde de ne, ya ku peyv û îbareyên ku li hember hev xwe îfade dikin, hev rave dikin, piştgiriye didin hev û di nav binyadeke kûr û sembolîk de dirûv girtine¹⁰. (Arvidsson 2006, 29)

2.7.Rabêja Renan

Bi serkeftin û têkçûyinan tijî ye jiyana Ernest Renan, ê ku dixwest bibe papazekî bawermend. Belê ev mixabin pêknehat û wek pisporê zimanên semîtik û ramangerekî lîberal jiyana xwe li *College de France*ê berdewam kir. Li gor Philippe Forest, “Ol demeke dirêj, wê ji bo wî bûbûya asoyek ku şupheyên wî, teqezî, pêşnûma û tetbîqkirinên wî têxe nava xwe.” (Renan 2016, 8)

Dema ku ji Bretonyayê derket û hat Parîsê, bi gotina wî, fam kir ku ji bilî ‘Serdema Pêşîn û Kîlîse’yê jî, hin tişt hene. Hebûna laîkên cidî û zana kifş kir. Dema ku li ser *Încîlê* şixulî, fikirî ku nakokî hene di hundirê *Pirtûka Pîroz* de. Ji ber fikrên xwe yê di pirtûka *Jiyana Mesîh* de li bertekan qelibî, lêbelê kitêb gelek hat firotin.¹¹

¹⁰Herwiha hurgiliyeke ku Arvidsson ji pirtûka *Black Athena*, ya Martin Bernal dabû, di derbarê hejmetkariya zimanên Hindî ya Schlegel de nîşeyeke balkêş e. “Li gorî Schlegel, ji bilî Hind-Ewropî zimanên dinyê bi giştî ji dengen heywanan ve derketinin. Miqabilê eleqeya xwe yî nijadê Schlegel tu carî giringiya ziman ji bala wî derneket. Cudahiyek bi vî rengî danîbû ji bo du cureyên zimanan: ‘yên êsil’, yanî zimanên serfikirî (flexional); - ‘yên kêm-esîl’, yanî zimanên ne-serfikirî (non-flexional). Yê ewilî ji kokeke ruhî, yê dawiyê ji kokeke heywanî ne.” (Bernal 1987, 231)

¹¹ Li gorî Amin Maalouf ê di derbarê Ernest Renan de nivîsek fewqelade nivîsiye, Renan hîn jî di çavên Kîlîseyê de nivîskarê *Vie de Jesus* ê cehenemî û dijminê Mesîhîfîyê, yê xeddar e. (Maalouf 2018, 129-130)

Ku em bînin bîra xwe wek şopgerekî baş ê romantîkên Elman û filologeî ku xebatên baş kiribû li ser zimanên qedîm, ne mimkûn bû ku Renan di derbarê zimanên Hînt-Ewropî de nenivîsanda. Di temamê jiyana xwe de Elmanyaya ku nerîta wê bi heyranî şopandibû, bi Fransayê re ket nava şerekî giran, wê çaxê ne zor e ku mirov texmîn bike bê çawa ketiye nava nakokiyên mezin:

Elmanya bûbû hosteyê min; min dizanî bû ku ji aliyên xwe yê baş deyndarê wê me. Miletê ku min hînî îdealîzmê kir, dema ku henekê xwe bi îdealîzmê kir û bi heman şiklî niştimanên Kant, Fichte, Herder û Goethe armancên neteweparêziyeke taybet şopandin, êşa ku min kişand nayê gotin. (Renan 2016, 23)

Di Renan de şoqeke mezin çêkir dema ku di sala 1871 ê de Frensa li hember Prûsyayê bi awayekî xerab têk çû. Di pêvajoya şer de li Parîsê bû. Bi rastî derheqê mijara afirandina mîteke netewî de mînakek ji Renan çêtir tune. Delîlên ku derheqê teoriya neteweperweriyê de derxistine holê, her tim şewq dane û destnîşankirinên wî yê li ser 'bûyer'a Arî, bêşik mîfîk in. Li gorî Leon Poliakov di sedsala 19 an de sponsorê sereke yê raya giştî yê Fransayê Ernest Renan bû. Renan bi israr digot, nijada Arî ji nijadê Samî him rasertir û him jî cudatir e. Dema ku Renan behsa Samiyan dike, ji pênûsa wî pêşdarazî û rik diherike. Bi tu awayî di derbarê Samiyan de fikrên wî yî êrenî nayê ditîn. Li cihekî wiha difikire: "Carekê ku mîsyona xwe yî monotêizmê anî cih, nijada Samî bi lezginî paşket û rêberiya meşa çarenûsa mirovahiyê tenê ji nijada Arî re ma." (Poliakov 2001, 259)

Hurgiliyên nijadperest ên di îdîayên Renan de, yê di derbarê rika Cihûyan de îfadeya herî berbelav ev du sed sal, hîn di meriyetê de ne. Lêbelê dema ku bi xwendineke baldarî em lê bînerîn, dijminên Renan ji Cihûyan bêtir Mislîman in:

Niha ji bo şaristaniya Ewropî belav bibe, şertê yekem ew e ku, divê her tiştên di derbarê nijada Samî de divê bê tunekirin û serdestiya teokratîk a Îslamiyetê bê hilweşandin. Ji ber ku Îslamiyet, encax dikare wek oleke fermî bimîne; dema ku bibe oleke azad û takekesî, wê bi temamî tune bibe. Ev şerekî ebedî ye, heta ku lawê herî dawî yê Îsmaîlî têkeve sefaletê yan jî heta sirgûnî nava çolê bibe, wê ev şer dewam bike. (Corm 2011, 43)

Mîna Étienne Bonnot de Condillac, Renan jî bawer dike ku ziman di derbarê giyan û karakterê miletekî de gelek agahiyan dide, “Hêsanî û yekahengiya nijadê Samî, ji bo zimanê wan jî rast e. Ew nizanin razberkirinê, metafîzîk ne gengaz e.” (Bernal 1987, 345)

Edward Said, di berhema xwe ya bi navê *Şarkiyatçılık* de cihekî fireh daye Renan bê çawa filolojî veguherandiye vegotîneke îdeolojîk. Peyvên Edward Said girîng in: “Xweseriya cuda ya Renan ne ew e ku peyvên li ser filolojiyê kirine, cihêrengiya wî ew e ku li ser rabêja filolojiyê peyiviye.” (Said 2017, 144)

Rabêja Arî di Ernest Renan de navekî wê yî din antîsemîtîzm e. Ew, ji nijadeke ku şecereya xwe dispêre Yewnana antîk îhamê digre û nasnameya Arî wek formeke mikemmel qebûl dike. Bi ya Renan li Rojhilatê şaristanî tune. Di vê erdnîgariyê de zordarî û kêfîtî teqez serdest e. Lakin gelên Hind-Ewropî nûnerên şaristaniyeke felsefî û zanistî ne:

Di derbarê zerafet, xweşî, û kûrahiyê de çi hebe li cem me ye. Bi rastî tiştê ku helbestî ye, çarenûsa mirovatiyê ye, ew vegeerên melankolîk, lêgerîna li

kokên xwe bi awayekî diltirsî û lawayên ji ezmên re ne. Em van tiştanan ji kesekî hîn nebûn. (Corm 2011, 42)

Renan haydar bû ku hizra netewî mîteke nûjen e:

Ji vir tê fêhmkirin ku netew di dîrokê de zede nuh e. Heyamên berê ji wan ne haydar bûn. Misir, Çîn û Keldaniya Qedîm tu carî ne netewe bûn. Ew kêriyên ku ji aliyê lawê ezmên û rojê ve dihatin birêve birin. (...) Di demên berê ên klasîk de komar, mîrnîşa bajaran, konfederasyona komelî yên lokal û împeratoriî hebûn, lê netewe wek ku em fam dikin tunebûn. (Renan 2016, 34)

Li gorî Renan Tirk, Slav, Yewnan, Ermen, Ereb, Surî û Kurd ên ku li erda Osmanî dijîn:

(... Îro jî wek roja fethê ji hev cihê ne. (...) Dema ku yê biserketî û têkçûyî xwediyên heman baweriyê bin yan jî dema ku yê biserketî baweriya yê têkçûyî qebûl bike, êdî ne pêkan e sîstema Tirkan, a ku mirov li gorî baweriyên xwe ji hev cihê bûye.” (Renan 2016, 36)

2.8.Sîstema Dumezil

Teza Arî ya Georges Dumezil ê pisporê dîroka gelan, di nav paradîgmayeke fireh de dirûv girtiye, ya ku rêçên zimanê Arî di xwe de dihewîne. Li gor Dumezil, zimanên Arî ji îdeolojiyeke gelemperî mîras mane. Di xebatên xwe de rêçên vê îdeolojiyê di metnên Roma de, di mîtên Yewnan de, di îlahiyên Hindî de û di sagayên qedîm ê Norveçê de dîtiye. (Anderson 2015, 1)

Bi ya Goerges Dumezil civaka Hind-Ewrûpî, ji aliyê ‘îdelojiya bi sê-fonksiyona’ ve hatiye binyadkirin: Rahîp, zagonçêker û qiral. Dumezil, di salên 1930’i de *Mit ve Destan* weşandiye ku di vê berhemê de têgeheke ku jê re gotiye ‘teoriya sê fonksiyonan’ pêşkêşî raya giştî kiriye.

Mîta Arî bi xebatên Dumezil ve vediguhere îdelojiyeke hêzê. Dumezil di heypeyvîna xwe yê bi Richard Kearney ve de dibêje pisporiya min bi gelemperî zimannasî û felsefe ye.¹² Ji ber wê dibêje gava ez li ser metnên Veda, Germen û Roma xebitîm min sê fonksiyone ferq kir, ya ku çavkaniyeke hevpar derdikeve. Dumezil teorîya van fonsiyonan bi têgeha ‘Îdelojiya Bi Sê Fonksiyon’ bi nav dike: Hikûmranî, hêz û berhemdarî. Ji Kearney re wiha dewam dike Dumezil:

Û ev rewş min bir encama ku ji Hindîstan heta Îrlanda, hebûna têgeha taybetiya sê-fonksiyonan di hemû çanda Hind-Ewrûpî de. (...) Bi kurtasî zimannasî derfet da min ku ez angaştê hebûna îdelojiyeke Hind-Ewrûpa bînim ziman. (Kearney 2010, 64)

¹²Helbet di heman demê de Dumezil mîtolojiyê jî. Belê ew xwe ji Levi Straus û Mîrcea Elida ve cuda dibîne: “Helbet pozîsyona min cuda ye. Min xebeta xwe li ser binyada îdelojiya şaristaniya Hind-Ewrûpa terxan kiriye” (Kearney 2010, 65)

Adnan Ekşigil piştî mirina Georges Dumezil di kovara *Tarih ve Toplumê* de nivîsek bi navê ‘Georges Dumezil’ weşandibû. Di wê nivîsê de wiha nivîsîbû di derbarê ‘îdelojiya bi sê-fonksiyon’ de:

Şibîneke cazîbedar di nava civaka Îrana Qedîm û Hinda de ji hêla li gorî dabeşbûna sîstema pola sêbare û ola Roma li gorî vesazkirina sê Xwedayan, heta ji şibîneke wêdetir beramberiyek heye. Ji nezîkahî û bi doneyên têr û tije ku em lê binerin, di bingeha vê beramberiyê de yekîtiyeke strûktûrel tê dîtin, ya ku sê-fonksiyonan pêkhatiye. Ev fonksiyonan, yên alimên olî, şervanan û mustehsîlan in. Li gorî vê, çawa Xwedayên Roma, Jupiter, Mars û Quirinus bi rêzê temsîla alimê olî, şervan û mustehsîl dike, di heman demê de di sîstema Hindê de brahman, ksattriya û vaisya destnîşan dike. (Ekşigil 1987, 50)

Dîsa di hevpeyvîna bi Kearney re Dumezil ‘sê-fonksiyon’ miqabilî sê lebatên mirov kiribû:

Ez di vê qenaatê de me ku her komên mirovan ji bo ku di jiyane de bimînin divê sê hewcedariyên biyolojîk ên bingeîn dabîn bikin: Her mirov xwedî mejiyek, destan û devekî ye û ev miqabilî kontrol (desthilatdarî), parastin (hêz) û xwedîbûn (bereket û istihsal) ne. Heywan û kêzik jî çer ku dest bi rexistinê dikin mumkin e ku li gorî van sê fonksiyonên bingeîn tevdiagerin. (...) Ji ber vê yekê hebûna ‘îdelojiya bi-sê-fonksiyonan’ nabe bê redkirin di destpêkirina yan jî bigheha xwezayê de (Kearney 2010, 67)

Weku Adnan Ekşigil jî neqil dike teoriya ku Dumezil pêşkeş kiribû di çarçoveyeke leşkerî yan jî şiyana emperyal derdixist holê: “Oleke ku rêveberiyê biparêze, sistemeke exlaqî û dadmendî ya bi îstiqrar, hêzeke parêzvan û êrişkar, axir seba xwarin û jiyanê pêwistiya sazûmana istihsalê.” (Ekşigil 1987, 50) Ekşigil ilawe dike ku dervî dinyeya Hind-Ewropî wêneyeke wiha qet nedixuya. Di tegihiştina Arî, ya di derbarê ‘yê’ din de, mînak di nerîta Semîtîk de wêneyek bi vî rengî çir tunebû? Bersîva wê li gorî Georges Dumezil di monoteîzmê de veşartîye:

Miqabilî ku fonksiyonên îlahî bi temamî îzafeyî xwedayên cuda bike, monoteîzm di Xwedayekî ‘qadîr-i mutleq’ de bi îsrar e. (...) Yehowa, yek û yekane ye. Ê lihevanîna vê îzaha alema monoteîstîk bi îdeolojiya fonksiyonên pluralîst re dervî ihtimalê ye. Ev di heman demê de ji bo monoteîzma Îslam û Mesîhîtiyê jî mewzûbehs e. (Kearney 2010, 71)

Di demekê nêz de bi vê teoriya Georges Dumezil gihişt asta lêkolînerên Ewropa yê rêzdar û gelek şopgerên wî çêbûn. Şopgerên wî bawer dikirin ku Dumezil di nasnameya Ewropî de alternatîveke ya Mesîhîtiyê di mîta Arî de kişf kiriye. Ji nav taybetmendiyên vê mîtê yek jê, tê gotin ku nijada Arî di nav malbateke mezin a ziman de (Latînî, Sanskrîtî, Fransizî, Swêdî, Farisî û hwd.) dirûv girtiye. Di heman demê de yên Arî, bejindirêj, zerî û çavşîn, yanî mînakên herî nûwaze yên *homo sapiens* hatine qebûlkin.

Li gorî Arvidson, Dumezil û şopgerên wî, li ser bingeha vê xewna nijadpererst (mîta Arî) a ku li gorî rewşa 1930 an hatiye çêkirin, înkareke teqez a

felsefeya lîberal a Ewropî hebû. Li dêleva vê felsefeyê, ‘‘îdelojiya bi-sê-fonksiyonan’ hat danîn. Li gorî Carlo Ginzburg, îdîayên Dumezil bûbû yek ji hîmên propagandaya Naziyan:

Rejîma Hitler, ji berdewamiya ku bênavber dihat îlankirin hêmaneke meşrûfî ya îdeolojîk bi dest dixist. Qene di bûyerekê de, Dumezil bi eşkerî digihîşt xala temayan, yên ku bi armancên propagandayê bèn bikaranîn, digihîşt xala pêşniyaran. (Ginzburg 2007, 260)

Ev têkildarkirina bi Hitlerîzmê ve navdariyeke xirap dabû hêmaya Dumezil. Bi taybetî jî, modela wî ji bo Hind-Ewropa pêşkeş kiribû, ya ku bi têgeha ‘îdelojiya bi-sê fonksiyonan’ li dirûv girtibû, li gorî hinek lêkolînanan ji Hitler re meşrûfîyeta tunekirina Cihuyan dabîn kiribû. Dumezil gelekî bi vê meseleya hate tawanbarkirin. Ji ber wê beriya bimre (mirina 1986) weku xweparastineke digot min ev model tenê ji bo ravekirineke pêşkeş kiribû. Jixwe îro, di dinyaya nûjen de bikaranîna vê modeleke pir xeter e û bibe sedemê gelek şeran:

Îdelojiya bi-sê fonksiyonan mexsûsî rabirdûyê ye. Ji ber vê yekê ne tiştêkî normatîv e, bêtir ji bo ravekirinê ye. Vê îdeolojiyê ji bo sîstemeke polîtîk a nû, anîna wê yê ziman pir xeter e. Gava îdeolojiya gelekî-şervan wek rehabilitasyona bi wan giştî têxe rîyeke xirab çî tişt diqewiminin me di Elmanyaya Nazî de dît. (Kearney 2010, 71)

Dîsa 1986 an de di hevpeyvîna *Le Nouvel Observateur* de têkildirkarina wî bi pîrsgirêkên siyasî xuyaye wî gelek aciz kiribû ji vê yekê pir bi tund peyivî bû. Digot karê min tenê pêşkeşkirina heqîqetan e. “Ez efsaneyan dikolim, wan didim hev, bi hev re berawird dikim. Pêşdaraziyên ku li ser vanan tê sazîkirin, sûtîfîmal e, herwiha ehmeqî ye.” Di heman hevpeyvîna *Le Nouvel Observateur* de Dumezil dinyaya Hind-Ewropa şibandibû zindanekê. Û peyvên dawîn ê Dumezil bi rastî meriv xemgîn dike: “Min dema xwe buhart. Ez dixwazim bimrim bêyî di hundirê artêşeke gelemperî de. Dixwazim azad bimrim.” (Dumezil 1987, 42)

2.9. Terka Sahneyê

Mîta Arî di hundirê dîrokê de di gelek guhertin û revîzyonan de derbas bû. Axirê gava ku têk çû, dîrokeke bi êş û ne paqij li dû xwe hişt. Di serî bi xebatên filoloji û etnolojiyê wek meseleyeke deskriptîv û masûmane li asoya Ewropa şewq dabû. Her ku çû di destên netewperwer, romantik û hêdî hêdî di desten nijadperestan veguhezî mîteke şerûd û nexweşiyê ku hinek netewan ji yên din rasertir bibîne. Belkû, wek di mînaka Dumezil de eşkere xuyaye, ew jî texmîn nedikirin wê bihêje vê encamê, yên ku bi wesfên antropolog, zimannas û zanyar ji bo geşedana wê bi kelecana dixebitin.

Ev mît taybetiyên wiha derxist di dawiyê de: neteweyê ku veguheziye leşkerî, ruhekî ku her tim amadeyî şerr û hesteke ku her tim dixwaze gelên din têxe bin hikmê xwe. Naziyê Arî yên Hîtlerî, di pêvajoya Şerê Cîhanê yê duyem de komkujiyên girseyî, mînak jenosîda Yahûdîyan kirin û xwe dan alî, ya ku di Îbranî de Soah tê gotin û îro bi navê holacoust ketiye lîteratura siyasî. Ji dêlêva Îsmail ê lawê Îbrahîm ê ku Renanî dixwest li ‘çolê bifetisîne’, dola Îshaq ê ku lawê din ê Îbrahîm bû, di menzelên xazê de hindik mabû ku bi tunekirinê ebedî re rû bi rû bihatana. Lêbelê Dumezil, piştî ku Nazîzm hilweşiya, careke din peyva ‘Arî’ telaffûz nekir. Piştî şer dewsa peyva ‘Arî’ dîsa îbareya Hînd-Ewropî girt. Di roja me de bikaranîna gramera leşkerî ya vê mîtê, di destê Neo-Naziyan de ye.

3. KURDÊN ARÎ Û DÎROKNIVÎSÎ

3.1. Mît û Edebîyat

Ku em mîtê wek formeke vegotinê qebûl bikin, wê gavê em ê şensê lêkolîna xwezaya fikra neteweyî bi dest bixin. Helbet, em li vir mecbûr in ku mîtê bi wateya wê ya fireh bi kar bînin. Em dizanin ku Benedict Anderson, konseptê zeman û mekân a gelên nûjen, di hundirê çanda vegotina romana rasteqîn de ditîbû. Vladimir Nabokov ê ku ne tenê romannûsekî navdar e, bi heman şiklî teorîsyenekî modern ê romanê ye jî, romana Ewrûpî ya modern wek şewêya mîten ku êdî deformekirî, hesibandîye. Ku em vê fikra wî bînin bîra xwe wê çêtir bê fehmkirin bê ji bo çî di hilberîna bîra hevpar de vegotin û çîroksazî ewqasî girîng in. Nîqaşên neteweperweriya prîmordîal bi giştî li aliyekî, ji bo çî *Mem û Zîn*'a Ehmedê Xanî bûye amentûya fikra neteweperweriya Kurdan. Pêwîstek e ku em li ser sedemên wê bisekinin. Hewce ye ku em fam bikin maneya vê berhema edebî ya ku bûye kevirê sereke yê Kurdewarî û pîrsgirêka Kurdistanê.

3.2. Wek Mîteke Neteweyî: *Mem û Zîn*

Gava ku Celadet Bedirxan bi mexlesa Herekol Ezîzan di kovara *Hawarê* de bi serenavê 'Klâsîkên Me' nivîsek neşir kiribû hewl dabû vê temsîlê bîne zimên, ya ku Ehmedê Xanî ne tenê nivîskarekî kurda ye zêdetirî wê, 'pêxemberê millî' ye. Bi rastî jêdera vê arketîpê digihêje Molla Camî. Camî ji bo pesnê Mewlana gotibû: "Her çiqas ne pêxember be jî, kitêbek pîroz nivîsiye".¹³ Belê li gorî Celadet, Xanî pêxemberê kurda ye. "Lê Xanî pêxember e jî. Pêxemberê diyaneta me ya millî, pêxemberê ola me ya neteweyî." (Bruinessen 2005, 77)

Heger ku giringiya Ehmedê Xanî wiha be divê rola wî yî millî jî bê famkirin. Bi rastî Celadet Bedirxan, gava ku nameyek Mustafa Kemal re şandibû, destpêka

¹³ Eslê wê yî Farisî wiha ye: *Men çî guyem der wesfî an alî cenab / Nîst peyxember welî dared kitab*

pirsgirêka kurdan bi serlehengê *Mem û Zînê*, bi Mem ve têkildar kiribû¹⁴. Li gorî ku Fırat Aydınkaya neqil dike, Bazil Nikitin jî minakek werê anîbû zimên. Nikitin dibêje, Xanî, Mem bi mîna yekî ‘dilsozê’ Kurdistanê rê dide. (Aydınkaya 2015, 79) Em dibinîn ku serlehengê *Mem û Zînê* wekî kesekî epîk tê nişankirin. Xanî ligel evîndarekî trajîk, lehengekî mîtîk ê netewperwer jî dahênandiye.

Çîroka Mem ji me re bahsa çî dike? Dema em şîroveyên alegorîk bidin aliyekî, tenê mesnewiyek dildarî wê derkeve pêşiya me. Herçiqas buyersazî balkêş be jî ku bi kurtasî em naverokê bixwînin, vegotîneke ku li her terefê dinyê minakên bi vî rengî hene, em dê bibînin. Di çîrokê de, evîneke sêkoşeyî bala xwîner dikişîne. Mem û Zîn, du dildarên ku ji hev hez dikin. Lehengê nebaşiyê Beko Ewan dixwaze pêşiya vê evîne bigire û bi dek û dolaban Mem dide kuştin. Zînê li ser gora Mem, ji êşa evîne dimre û li kêleka heman gorê tê veşartin. Beko piştî van bûyeran diçe xwe di nava her du goran de vedişêre. Ew jî tê kuştin û xwîna wî diherike binê gorên wan da ku her duyan ji hevdu biqetîne. Piştî ji vê xwîne striyek peyda dibe da ku heta ebedê cudahiya Mem û Zînê berdewam bibe.

Şîrovekarên ku ji texlîla alegoriyan hez dikin, dikarin gelek sembolan di vê çîrokê de bibîne. Mînak Amir Hassanpour vê cudahiya Mem û Zînê berawirdî Kurdîstana perçebûyî dike, ya di navbera împeratoriyan Pers û Osmanîyan de. Di nav mîrên kurdan de Beko bi hêmayê ‘bêtifaqî û şîqaqî’ tê destnîşankirin. Bi ya Hassanpour, Xanî hêvî dike ku, rojekê wê strî ji holê rabe û wê ‘ittîfaq’ însa bibe. (Hassanpour 2005, 171-172)

3.3. Hevîyên Ehmedê Xanî

Erê mesnewiya Xanî li gorî gelek şîrovekaran bi temsîla Kurdistanê ve gîredaye. Yek ji wan Cemal Nebez çîroka *Mem û Zîn* wek daxwaza Kurdîstankê serbixwe dixwîne. Bi ya Nebez, Ehmedê Xanî bi vê mesnewiyê hewl daye ku, kurd destê hev bigrin û xwe ji hegemoniya tirk û farisan rizgar bikin:

¹⁴Ji bo nirxandinek li ser *Mustafa Kemal'e Mektup* (Demir 2015)

Ehmedê Xanî (1650/1-1706) bang dike ku, kurd bibin yek, dewletek serbixwe ava bikin, xwe ji desthilatdariya tirk û farisan xilaskin û li padişahêk, tacek, pereyek û çandek kurdî bigerin. Bir ser de Xanî şehzadeyên kurdan rexne dike ku ew çewisandina kurdan dipejirînin ya ku ji teref tirk û farisan ve tê tetbîqkirin. Ku em van taybetiyan bi tamamî binirxînin, sazkirina fikra dewletek kurd û Kurdistanê serbixwe, bi rêberiya padişehêkî kurd li Kurdistanê bilind bûye; - ne ya ji biyaniyan hatiye deynkirin. (Bruinessen 2005, 105)

Raveka 'rêberiya padişehêkî kurd' girîng e. Ku em ji Weber îlham bigrin, heger ku serokekî karîzmatîk ji dîrokê derkeve û gel mobîlîze bike, wê însakirina netewe-dewletê hêsantir bibe. Li gorî Nebez Xanî bi fikrê ve mijûl e. Rêzikên ku Xanî di *sebeb-i telîfa Mem û Zîn* de nivîsiye kilîda vê mijarê:

Ger dê hebuwa me ittifaqek

Vêk ra bikira me inqiyadek

Rom û 'Ereb û 'Ecem tamamî

Hem'yan ji me ra dikir xulamî

Tekmîl dikir me dîn û dewlet

Tehsîl dikir me 'ilm û hikmet

Ji ber vê yekê, raveka 'hebûya padişahêk' hêviya serokekî karîzmatîk e jî. Weku netewperwerê ereban ê navdar Sati-Al-Husrî bo yekitiya ereban di hêviya Bismarckekî ereb de bû (Luca 1998, 86);- li gorî Nebez, Xanî bixwe li pê vê şopê bû.

Şîroveyên di derbarê Ehmedê Xanî de rêzîkên ku me li jor dedstnîşan kirine bi temamî peyamên siyasî hildigrin. Heger ku Xanî pirtûka *Mem û Zînê* bi armanceke siyasî nivîsîbe, divê em pîrsgirêkên anakronîzmê jî çareser bikin. Fikra ‘netewe’ yî di Ehmedê Xanî de çawa pêk hatibû. Li gorî *Encyclopedia of Islamê* peyva ‘millet / netew’ beriya sedsala 19 an dihat wetayek dinî. (Hassanpour 2005, 166) Bi rastî Benedict Anderson jêrenota ku di pirtûka xwe yî bi navê *Hayalî Cemaatlar* de daniye, peyva ‘nation’ heta dawiya sedsala 19 an de qet ne di wateya îro de bû:

“Kemilain dibêje di sedsala 19 an de, di gelek ferhengên standart ev peyv nedihat wateya îro. Adam Smith bixwe dema ku li ser ‘maldariya milletan’ di sekine ji wateya ‘civak’ yan jî ‘dewlet’ê bêtir, tiştek nedihat bîra wî. (Anderson 2015, 18)

3.4. Peywîra Alegoriyê

Ji bo ku em vê anakronîzmê fam bikin pêwîst e em li ser meseleya analîzên metnên klasîk piçekî rawestin. Di metnek klasîk de (çi olî çi mîfîk be) dema ku naverok ne li gorî dilê me be û armancên me yî siyasî hebin ewçax stratejiya alegoriyê wê gelek bi fêde be. Jixwe weku Remazan Alan dupat kiribû hewldana anakronîzm pîr caran ji ber ‘tazyîqa ‘îro’ ye. (Alan 2013, 118)

Gregory Jusdanis pîr xweş aniye ziman ku ji bo metnek bibe ‘kanonîk’ lazim e bê şîrove kirin. Her ku şîrove pîr dibin metn bêtir qalîkekî pîroz hildigre:

Metnek ku hizmetê ji civakeke re dike û ji bo ku ji tariyê rizgar bibe, tenê bi saya sîstema belavkirina çandî mumkin e. Ji vir de pê ve dikare (ji metnên) jêgirtin bîn girtin, bê analîzkirin û ji nû ve bê hilberîn (reproduction). Belkî bi demê re kanonîze bibe. Hêmana sereke ya şîrove kanonîzekirin e.” (Jusdanis 2015, 115)

Di nerîta edebiyata rojhilat de miqabilê şîroveyên ku mesnewiya Ehmedê Xanî derxistiye holê bi ihtimaleke mezin wê tune be. Bo misal di nerîta tirkî de mînamek wiha xuya nabe. Dibe ku *Şahnameya* Firdewsî bişibe vê mînamekê, belê berhema wî jî bi temamî ji çîrokên mîtik û cûrbicûr pêk hatine. Nerîna *Mem û Zînê* ya nûjen di tespîta Martin van Bruinessen de net e: “Di nava kurdên sedsala 20 emîn de, berhem temsîla veya temsîl dike ya ku him xirûra kurdan ya etnîk û daxwaza dewleta kurdan .” (Bruinessen 2005, 63-64)

Metnên ku bi stratejiya alegoriyê rave dibin pir caran ji naveroka xwe pir dûr dikevin. Lê naverok jî tiştekî ku hin caran xweş nayê zevtkirin. Naverok wek ku Willem de Kooning jî dibêje, di kêliyeke de xwe rê dide, dişibe çirûska ji nişka ve. Ku em Konning bişopînin encam wiha ye: Şîrovekirina metnên klasîk hin caran li qonaxeke sîyasî diqelibe. Naverok tê guhertin û vediguherî zimanê îro. Heger ku rewşa îroyîn ji bo gelê pêwendîdar re xeterî û têkçûniyê destnîşan bike, wê demê metnên klasîk bêtir bi giring û bi wate bin.

Susan Sontag di gotareke xwe navdar ya bi navê ‘Li Dijî Şîroveyê’ de mînameke balkêş ji metnên pîroz ên cihûyan dide. Balê dikişîne naveroka *Strana Sileman* û dibêje rêzikên di vê stranên de derbas dibin bi awayekî eşkere behsa wateyeke erotîk dikin. Belê xwendineke wiha, ya di derbarê metneke pîroz de pîrsgirêkên mezin peyda dike. Di rabêja şîrovenasên Cihû û Mesihîtiyê de rêzik tenê sembolên manewî nîşan didin

Ji ber ku alegorî ji mejiyekî hişk û tund derdikeve şîroveyên wê, wateya naverokê bin pê dikin. Objeya li ber destê me vediguhere objeyeke pîroztir. Wek ku Nietzsche dibêje diyarde tune ne; - tenê şîrove hene. (Sontag 2013, 132)

Bi sedsala 20 an ve di nav rewşenbîr û dîroknasên kurdan de di derbarê nasnameya neteweyî de pîrsa yekem bêguman ev bû? Em kî ne? Kurd dikare di kîjan etnolojiyê de bê hesibandin û jêdera vî miletî çi ye? Weku ciranên nêzîk (tirk, ereb, faris) îdîa dikin gelo rast e kurd ji nijadeke xweser bê par in?

3.5.Pirsgirêka Kokan

Begûman tespîta koka tenê bi motîvasyonê zanistê ve nayê rave kirin. Dema ev tespît ji bo netewan be siyaseta bêtir tevî meseleyê dibe. Vê ya eşkere ye ku neteweperwerên kurd koka neteweyê digihêjin ‘demekê zerîn’ (ku li vir Medya vê demê temsîl dike) ji bo ku meşrûfîyeteke dîrokî ji daxwazên xwe re dabîn bikin. Di vê pêvajoyê de dîrok helbet vediguhezî qada îspat û niqaşan. Ji ber ku erka xebatê di serî de li gorî cihetnûmayeke siyasî tê sazîkirin, armanc ne kişîkirina rastiyên emprîk in; herî pir îşakirina hêmayê neteweyê ye. Êdî pîrsgirêk berê xwe dide îqtidar û reqabetên di hundirê wê de.

Herwiha, pîrsgirêka koka kurdan tu carî nebûye meseleyan kurdan tenê. Heta dewletên ku kurd hemwelatîyên wan in, bêtir vê meseleyê eleqedar dibin. Sebeba wê helbet pêşîya berrîna hinek daxwaz û mafan in. Di pîrsgirêka kokê de weku her neteweyan kurd ketine nav niqaşên cûrbicûr. Neteweperwerên kurd dixwazen ji xwe re kokeke otonom û dervî rabêja dewletên deshilatdar bibînin. Bi destpêka sedsala 20 an weku nerîtekê rewşenbîrên kurd hembêza xwe ji ‘mîta Arî’ re bi comerdî vekirin. Îro ev mît weku hamleyekê stratejîk bêtir bi kêrî kurdan ve tê. Ji ber ku di rojhilata navîn de kurd weku populasyonekê di nava sê neteweyan de dijîn, yê ku di heman demê de xwediyê dewletê ne jî: Ereb, tirk, faris.

Bi rastî dîroknasên kurd her tim xwe di nava polemîkên koka neteweyê de dîtine. Em ê li vir kurtasiyeye bidin bê her sê netewên ku me li jor destnîşan kirine, çawa fikirîne di vê behsa koka kurdan de. Di pirtûkekê gelek siyasî û îdeolojîk de, ya ku ji terefî yekî kurd hatiye nivîsin ku bo vê armanca me beşeke pir baş tê de heye. Pirtûk bi Tirkî ye û nivîskarê wê jî Ethem Xemgîn e. Navê pirtûkê *Kürdistan Tarihi* ye û çapa xwe ya yekem piştî 12 îlonê (1982) kiriye.

Ji zimanê pirtûkê em fam dikin ku Ethem Xemgîn dixwaze pîrsgirêka kurdan bi riya dîrokeke dewlemend bîne rojevê û li hember cuntaya 12 ê Îlonê hebûna kurdan biparêze. Jixwe piştî derbeya leşkerî mecbûr maye derkeve Ewropayê. Piştî 38 salan di nexweşxaneyê Elmanya jiyana xwe ji dest daye. Xemgîn di pirtûka *Kürdistan’da Dini İnançlar ve Etkileri* de di wê baweriyê de ye ku pêşketinên dîrokî, aborî, civakî û siyasî yekem car li Kurdistanê pêk hatine û ji wir belavbûne dinyayê.

Di serê *Kürdistan Tarihi* de îdîayên ku her sê netewên navborî ku di derbarê koka kurdan pêşkeş kirine Xemgîn yek bi yek behsa wan dike. Ji ber ku ereb ji kokeke semîtîk in gelek rewşenbîrên Erebb, vê koka Samî nisbetî Kurdan jî dikin. Li gorî Xemgîn neql dike, Mahmut Alusî ji pirtûka *Kamusul Muhit* jegirtan digire ku di eslê xwe de kurd û ereb ji heman kokê ne. Herwekî din, li gorî hînek dîroknasê ereban, yên Samî di teqrîba 4000 û 3000 ên B.Z. ê ji Bakurê Efrîqa ewilî çûnên Misirê, ji vir jî di ser Filistîn û Sûrî re berê xwe dane Mezopotamyayê. Piştî zimanê xwe ji bîr kirine. (Xemgîn 2004, 18)

Dîsa hinêk dîroknas îdîa dikin koka kurdan ji ‘Rabia-bini-Nazar bini Mâd ê Erebb’ tê yê ku li Diyarbekîrê û Diyarımudarê (Rakka) hikumranî kiribû. Paşê ji ber ku bendeva Merep hilweşiyaye û seba wê av rabûye, ew û ên Gassanî derketin çiyê, li vir bi çend qewmên din tevlihev bûnê û Erebbî ji bîr kirine.

Di berdewamiyê de ji dîroknasêkî ereb (ku navê wî nade) behsa têkiliya kurdan û pêxemberê Cihûya Hz. Sileman kiriye. Li gorî çîrokê kurd ji cinnekî bi navê Cahil yan jî Cesad tên ê ku Hz. Silêman wî ji meclîsa xwe qewirandiyê. Çend ramanger jî di wê qenaatê de ne ku kurd civakeke cinnî ne ku Xwedê perde ji ser wan rakiriyê. Îdîayeke din ew e ku hinek cin bi keçên Hewa re zewicîne û ji wan kurd welidîne. Piştî ku wan agahiyan neqil dike Xemgîn helwesteke pir tûnd nîşan dide:

Ev tezên ku nivîskar, dîroknas û ramangerên erep di derbarê gelê Kurd îdîa dikin, eşkere ye, ji aqil û mantiqê dûr in. Nêrînên wan bi temamî dervî zanistiyê ye. U nîşana xapîn û sextekariya wan e ku dixwazin gelê kurd bi xwe ve giredin. (Xemgîn 2004, 19)

Gava mijar tê ser Farisan ev car bala Xemgîn Firdewsî û *Şahnameya* wî dikişîne. Li gorî Firdewsî kurd Îranî ne û bi hev re ji zilma Dehak reviyane. Xemgîn baldikişîne ser rewşenbîrên nûjên ên Îranî ku ew jî di baweriyaya ku kurd Îranî ne û Kurdî jî lehçeyeke Farisî hatiye.

Gava ku koka kurda li Tirkiyeyê tê rojevê li gorî Xemgîn rewşeke cuda xuyaye. Li vir dîroknasên fermî qet qebûl nakin ku neteweke bi navê kurd di dîrokê de cih girtine. Dîroknas di wê baweriyê de ne ku ên ku îro xwe wek kurd qebûl dikin di eslê xwe de ew ji hesta tirkbûn û hişmendiya wê yî neteweyî dûr ketine. Fikra gelemperî li Tirkiyeyê ew e ku kurd di rastiyê de yek ji şaxên ‘Oğuz’ an ve ne. Ethem Xemgîn behsa pirtûkeke propagandativ, a bi navê *Doğu İlleri ve Varto Tarihi* dike ku ji teref M. Şerif Fırat hatiye nivîsandin û li binê pêşgotina wê jî îmzeya serokê dewletê Cemal Gürsel heye. Gürsel dibêje xwendina vê pirtûkê wê gelek feydeyên mezin dabîn bike ji bo rewşenbîrên tirkan. Çimkî ev berhem îspata tirkbûna hemwelatîyên ku li Anatoliya Rojhilat dijîn, ên ji ber bi zimanekî ku naşibe Tirkî dipeyivin, xwe tirk nahesibînin. Encamê wiha datîne Gürsel: “Li ser rûyê dinyê nijadeke ku bi nasnameyê otonom weku Kurd bîn navkirin tune .” (Xemgîn 2004, 20)

3.6. Rabêja Hebûnê: Nasnameya Arî Ya Kurdan

Di beşa teoriyê, ya di ‘Rabêja yê Din’ de, em hurgilî li ser hêmaya ‘yê din’ sekinî bûn û me gotibû bi saya ‘yê din’ nasnameya neteweyî xweştir û saxlemtir tê avakirin. ‘Yê din’ endamên neteyewê li ser lingan disekinîne da ku ji bo îxtimala şer, dijmin û xetereyên hwd. Zûtir û bawermendtir mobîlîze bibin. Nasnameya Arî Ya Kurdan him ji aliye dîrokeke giranbûha û him jî ji redda û lidijderketina ‘yê din’ motîvasyoneke xurt daye neteweperwerên kurdan. Bi rastî hîn di sedsala 19 an de gava Şêx Ubeydullah ji dîplomatê Emerikî, ji Kohran re nameyek şandibû ev dupatkirina cudahiyê eşkere bû:

Kurd, ji aliye mezheb, adet û toreyên xwe ve ji milletên din cuda ne. Serokên eşîrên kurdan yên ku din bin deshilatdariya Îran û Osmaniyan de dijîn, li ser vê xalê gotina xwe kirine yek, ku ev kar êdî bi her du dewletan devam nake. Ji bo ku rewşa me bibînin û hinek tiştan bikin, divê em bala Ewropîyan bikişînn ser xwe. Em jî miletekî serbixwe ne û em dixwazin

kare xwe em bi rêve bibin. (Yıldırım, Pertev ve Aslan
2013, 56)

Bê mibalaxa di sedan pirtûkên li ser dîroka kurdan de gava mijar tê ser derbirîna kokê, peyva ‘Arî’ bûye weku qaîdeyek lihevkerî derdikeve pêşiya me. Peyva Arî çawa ji bo gelek netewan serbilindiyekê nîşan dide helbet ji kurdan re jî heman wate ye. Belê gelek caran Arî tê wateya nasnameyê diyarkirî, ya ku sazkirina cudahiya kurdan ji ‘yê din’ ve destnîşan dike. Netewperewerên kurd vê yekê gelek zanin ku di erdnigariya ku dijin îdelojîya fermî, kurdan wek neteweye serbixwe nabînin û kurdan mîna qaîdeyek bêniqaş daxilî çarçoveya neteweyên xwe dikin.

Zülküf Ergün baldikişîne ku peyva Arî di nav weşanên Kurdî de cara yekem di kovara *Rojî Kurd* derdikeve holê. Ku em ê di beşên dawîn de bêtir li ser bisekinin di vir de jî Ergün destnîşan dike ku di nava mîta Arî û efsaneya Dehak de pêwendiyên xurt henin. Weku tê zanîn efsaneya Dehak di *Şahnameya* Firdewsî bi hêmayê ‘hebûn û tunebûna’ miletekî wateyê siyasî hildigre. Di *Rojî Kurd* de Kurdiyê Bitlîsî li ser vê efsaneyê, ‘esla’ kurdan niqaş dike û bêtereddûd dibêje kurd ‘Îraniyên heqîqî’ ne: “Kurd neteweyeke heqîqî ya Îranê ne û ji mêj ve aşiqê azadiyê ne bi armanca parastina azadî û serweriya xwe berê xwe dane çiyayan û çiya kirine penagaha xwe ya ebedî ya azadiyê.” (Ergün 2017, 99-100) Zülküf Ergün agahiyeke giring dide ku niqaşên koka kurdan di *Jînê* de di ser cûreyê helbestê meşiyaye. Mînak Laxûtî Xan di helbesta ‘Bo Nejada Kurd’ de di ser împatoriya Med û Keyaniyan de ve kurda daxilî çarçoveya Îranê dike.

Kurdan ku hemûyan Medî û neslî Keyan in

Lem fikre çi lewn xefletyan kird eme renga

....

Îran weku cîsmek e û Kurmanc e le wî dest

Destê ku cuda bû le beden, mirdû û leng e (Ergün 2017, 101-102)

Yek ji helbestvanekî ku kok û şaristaniya kurdan di helbestê de li gorî van hêmayan aniye ziman Ehmedê Palo ye. Hêma û sembolên ku di helbesta Palo de cih girtiye jixwe ev ji sedsaleke zêdetir di nav kurdan tên niqaşkirin û gelek ji wan wek lihevkirineke hatiye qebûlkirin:

Ararat Arî ye agir didêre

Wiha laşê neyaran tev dihêre

Dibê pêşî cîh im bo Kurdê Arî

Ji nava min wiha agir dibarî

Di bergê û felsefeya helbesta Palo¹⁵ de kurd wek mensûbekî nijada Arî bi sembol û hêmayên dîrokeke navdar derketinin pêşberî me. Di helbesta Ehmedê Palo de ‘Zerdeşt, Brahim, Nûh, Gûtî hwd.’di çarçoveya têgihîştina ‘Arî’ de wateya nasnameyeke siyasî hildigre û bi birewerî meseleya ‘kokê’ destnîşan dike. Helbest ne belasebep bi van rêzîkan dest pê dike:

“Ararat Arî ye agir didêre

Wiha laşê neyaran tev dihêre”

Ji ber ku di nava peyvên Ararat û Arî de him alîterasyonê çêdike û him jî wek sembolîzmeke silavake li ‘çanda çiya ya kurdan’ ve dike. Di nava peyva Arî û

¹⁵ Ji bo gotareke baş li ser hêmayên heşbetên Ehmedê Palo bnr, (Başçı 2019)

çiyayê Agirî de li analojîyeke bi vî rengî em di hişmendiya Îhsan Nuri Paşa de jî rast tîn

Serokê serhildana tekçûyî ya Agirî Îhsan Nuri Paşa¹⁶ di destpêka pirtûka *Ağrı Dağı İsyanı* de bêdudilî kurdan wek ‘Arî’ dide nasîn. “Serhildana Agirî, di riya şerê serxwebûn û azadiya netewê Kurd ê Arî (Îhsan Nuri peyva ‘Aryen’ bi kar tîne) de yek ji wan rûpelên dîroka namdar a xwînbar e.” Nuri Paşa, gelê kurd bi rengdêrên weku ‘mêrxasî, qehremanî, jiyana serbestî û cengawerî’ silav dike, di navbera kurdên Lorî, kurdên Erzurumî, libên rojhilata Îranê, hemû Kurdên Îskenderûnê tu ferqê nabîne û dibêje, “Hemû Arî xwediyê van rengdêran in. Ya rasttir, ev kemal û qehremanî ne tenê mexsûsî yên Agirî ne.” (Paşa 1992, 13)

Nuri Paşa di *Kürtlerin Kökeni* de vê carê navê hin dewletan dide, yên ku bi refereyeke di tesnîfa Arî de tîn qebûlîkin: “Ji bo ku em dîrok û çanda Kurdan têde bigihêjin û fambikin, divê dîrokên dewletên ku ji teref kalikên kurdan ve hatine damêzrandin, em bikolin.” Navên wan wiha dide Îhsan Nuri Paşa, “Gûtî, Sûbarî, Lolî, Kûsî, Mîtannî, Nayrî, Mûşkî, Xaldî û Medî.” Li gorî Îhsan Nuri Paşa dewleta kurdan a herî kevn Gûtî ye û serokê wan ê ku Sumerî wek ‘Ziw Kidu’ binav dikin Hz. Nûh bixwe ye.¹⁷

Nuri Dersimi di wê baweriyê de ye ku koka kurdan digihêje Mittaniyan. Bi ser de li gorî Dersimi gava ku li analîza morfolojîya berhemên Mittanî bê nerîn, ji aliyê zimannasiyê ve nezikayiyên mezin bi lehçeyên Kurdî ve têkildar, wê bê dîtin. Nuri Dersimi, ji bo entnolojîa kurdan jêgirtinekê wiha ji Peter Lerch dike:

Yên kurd gelekî ku mirasa xwe yî nijadî bi gelemperî ji ev Xaldiyên nijadeke Îranî stendine. B. Z. ê di 3000 an de yên Xaldî bi riya îstîlayê Babîl girtin, temamê Îraqê zevtkirin û roleke mezin lîstin di avakirina dewleta Asûrî de. Di nava eşîretên kurdan de rashatina

¹⁶ Ji bo kurtyeya jînenigariya Îhsan Nuri Paşa (Cibo 2004)

¹⁷Nql: (Bender 1991, 47)

tîpên cazibedar û letîf xebatên nû îspat dike ku vê ya
mexsûlê têkeliya pir berê ye. (Dersimi 2004, 12-13)

Herçiqas diyardeya Arî di gelek xebatan de bi beşên dudirêj û berfireh hatiye
niqaşkirin, tesnîfkirin û ravekirin jî wek vesazkirina pêwendiya kurdan ji aliyê çend
beşên diyarkirî ve bê sînorkirin wê baştir be.

3.7. Cejna Arî: Newroz

Îro di derbarê mîtên kurdan de, yên ku wateyên siyasî hildigrin bêguman
newroz di rêza yekem de ye. Weku me li jor jî destnîşan kiribû di serê sedsala 20 an
de di *Rojî Kurd* de gava ‘kok û esl’ê kurdan bûbû mijara niqaşê, hêmayên wek
‘newroz, Dehak, Kawa, hwd. derketibû pêşî û bi demê re cejna ‘newroz’ê bi van
hêmayan ve veguhezî ‘mîteke damêzrîner’. Helbet wek her mîtan ev mît jî xwediyê
çîrokekê ye. Gürdal Aksoy, ku di vê xebatê de em ê gelekî cih bidin analîzên wî,
pirtûkeke xweser li ser *newrozê* nivîsiye û weku ilhama xwe ji mîtologê navdar
Claude Lévi-Strauss sitendiye, ‘mît’ê bi wateya sembolekê şîrove dike. Loma mît ji
nerîta yekem ve ji me re çîrokekê vedibêje; - belê ji aliyekî din ve ronîkirina sembola
watedarkirina fenomenekê jî temsil dike.

Mîta newrozê bi gelemperî di *Şahnameya* Firdewsî de derbas dibe. Belê
wexta koka vê mîtê tê ajotin çend motîvên bi wê re têkildar di *Avesta* de jî henin.
Dîsa ji bo têgihîştina kurdan versiyona *Şerefnameyê* wê maqûltir be ku em li ser
bisekinin û analîzeke bikin. Çîrok di serê *Şerefnameyê* de wiha derbas dibe:

Li gorî Şerefxan yek bi navê Dehak (Biwrasp) di dîrokê de heye ku taybetiya
wî herî berbiçav li ser du milên birîneke xeddar hebû û bo ku ev birîn çareser bibin
divê serê du însanan bê jêkirin da ku mejiyên wan li vê birînê kin. Şiklê vê tedawiyê
bi ya Şerefxan ji Dehak re şeytan ditîye ku xweş derdikeve holê Dehak nûnerekî
xerabî û zilmê ye.

Her roj du kesên ku mejîyan ji bo ku ji birînên Dehak re aş bibin dihatin kuştin di nava gel de kaoseke mezin peyda kiribû. Gel êdî ji ber Dehakê xeddar li benda çareseriyekê bû. Yekî ku li ber destê dixebitî ji çêkiriba dermanê Dehak nema debar kir û fikret hat bîra wî. Li gorî vê fikrê ev mirovê ‘dilnêrm’ ji wan herv du xortan yekî azad dikir û mejiyê yê din bi yê miyekê tevlihev dikir dida Dehak. Her ku dem derbas bû, yên ku hatin azadkirin li dora çiyayekî kom bûn: “*Ji wan xortên tek tek ên azadkirî, civatek gelek zêde ji hemû reng û cure bi awayî zimanên ji hev cihê, di çiya de li hev kom dibin. Xizmî û mirovatî dikeve navbera wan û bi benên xizmatiyê bi hev re tîr girêdan. Biyanîti û xerîbî ji nav wan radibe, zar, zêç û neslek zêde pey wan dikeve û navê ‘Kurd’ li wan tê kirin.*” (Bedlîsî 2014, 62)

Versiyona *Şerefnameyê* di têgiştina kurdan de bêtir cihekî girig girtiye û bûye wek ‘mîteke damêzrîner ya kurdan’. Helbet ya Firdewsî pir muhîm e lakin di derbarê ku neteweyek çawa daxîlî dîrokê dibe ev versiyon li gorî rê û rêbazên mîtên neteweyî watedartir e. Gelek motîvên wiha di mîtên dinyayê de hene, yên ku netewe çawa derketinin ser rûyê dinyayê. Mîtên damêzrîner (him di ya Romus û Romulus him jî di ya Aenaes d) e Roma wiha ne

Siraç Bilgin pirtûka *Newrozê* di sala 2000 an de çap kiribû ku bi baweriya wî gelê kurd li gor demên berê êdî bêtir li ser dîrok û çanda xwe bi hişmendî disekin û lazim e ev ‘ev cejna ya kevn’ bi awayekî zanistî û ji gumanan azad, bê famkirin da ku wêneyeke rast têkeve destê me. Bilgin wek di gelek pirtûkên xwe yên din jî diparast koka newrozê ji aliyê nivîskî ve bi *Avesta* ve dest pê dike. Lakin Siraç Bilgin dibêje min ne di *Avesta* de jî di belgeyên dîrokî de yên heta Îslamê peyva ‘newroz’ê tespît nekir. Belê piştî Îslamê derbarê newrozê çavkanî pir dibin. Hele ku di *Şahnameya* Firdewsî de çîrok û navên legengan pirtûka *Avesta* dike berhemeke giranbûha:

Herwiha weku navê wan ji teref nivîskarê Farsî yê hêja Firdewsî ve hatiye neqilkirin, hemû figurên Newrozê, yanî Dehak (Aji Dehaka), Cemşîd (Yima), Ferîdûn (Threataona), Kawa (Kava) û agir (Ahtar)

dîtina cihgirtina wan wek figûrên giring yek bi yek di Avestaya Ciwan de jixwe delîlên baş dabîn kiribû ji min re. (S. Bilgin 2018, 16)

Siraç Bilgin di vê baweriyê de ye ku heyîna hemû figûrên newrozê di *Avesta* de ne belasebep e. Li gorî Bilgin ev figûr wek perçeyên bitûna mîtolojiyeke diyarkirî ketine vir. Ku perçeyên wendanebûyî di destê me de hebûya di qenaeta Siraç Bilgin de bi îhtimaleke mezin wê *Avesta* newrozê mîna mijareke serbixwe peşkeş kiriba:

Fîgurên Newrozê weku Cemşîd (Yima), Dehak (Aji Dehaka), Ferîdûn (Threataona), Kawa (Kava) û agir (Ahtar) nerîteke diyarkirî rê didin. Cihgirtina wan giring e di erdnigariya nivîskaran de, yên ku *Avesta* însa kirine yan jî di yên ku ji nû de şêwe dane vê berhemê. Em dikarin vê ya bi figûrên menqibeyên ku di Qur'an, Încîl û Tewratê de cih girtine jî berawird bikin. Wek figûrên Qewmê Ad, Adem, Nûh (Noak) welatê Saba hwd. ji seba ku di berhemên olî yên Rojhilata Navîn de (ku di yekê de tune be di yan din heye) cih girtine, di *Avesta* de nikarin cih bigrin. Ji ber ku ev nivîs û figûr ji bo Arîyên wê heremê ve xerîb diman. (S. Bilgin 2018, 35)

Piştî tespîtkirina figûrên newrozê di *Avestaya Ciwan* de Siraç Bilgin derxistina vê îstidalê wek mafekî dibîne: “Heger *Avesta* mîrasa çandê ya kîjan koma Arî be, festîvalên wek Newrozê, ya ku bi figûrên wî gelî şêwe girtiye evçax wê mîrasa çandî ya komên wî gelî be. Ev jî pir tabî ye.” (S. Bilgin, Newroz 2018, 56)

Siraç Bilgin di vê pirtûkê de dixwaze li newroza kurda xwedî derkeve ku di sala 2000 an de nivîsandina vê pirtûkê li gorî dema çapkirinê bifikirin ku wê demê li ser nasnameya newrozê niqaş hebûn, ya ku ev cejn a kîjan netewê ye. Bilgin ev

pirtûk bi helwest û bertekeke siyasî nivîsîbû. Heger ku kurd ji kokeke Arî bin lazim e ku çend simbolên netewî yên kurdan jî di vê kontekstê de xuya bin. Ewçax wê newroz cejna gelên Arî be û bêgûman ev cejn bi şeweya watedar bibe ya kurdan.

Têkildarkirina newrozê bi mîta Arî ve di pirtûka Siraç Bilgin de mîna mîtên afirindîna wateyeke kozmogonîk hildigre. Bilgin baldikişîne ser sîstema teqwîma Zerdeştîyan û tîne bîrê ku Xwedê di 16 adarê dest bi afirandina mirovan kiriye û (ku ev pêvajoyek wek ‘Rojên Farvardigan’ tê zanîn) di 21 ê adarê de afirandin qedandiye: “Ariyên qedîm bawer dikirin ku di her kêliya rojavaya 20 ê adarê de wê rihê kalikên wan xaniyên xwe yê kevn ziyaret bikin û piştî roja din, gava ku roj derkeve wê xanî terk bikin û vegehin cihên xwe yê asimanê.” (S. Bilgin 1996, 51)¹⁸

Di dîroknivîsiya kurdan de giringiya newrozê wiha mezin e ku hin kes rexneyên balkêş li ser Firdewsî kirine, yê ku îro bi saya *Şahnameya* wî di derbarê newrozê de em xwedî agayiyên giranbûha ne. Mînak Latif Epeözdemir ji bo ku ‘Firdewsî newroz kiriye malê farisan’ wî bi kiriyareke ‘manîpulyasyonê’ û şexsê jî wî bi rengderê ‘şovenîst’ tawanbar dike:

Weku tê zanin kurd neteweyeke ku ji hêla mensûbiyete Arî ne. Belê îro navê ‘Aryen’ ji teref Îraniyan ve hatiye manîpule kirin û wek ‘Êran’ hatiye guhertin. Îran bi tena serê xwe xwedî li mîrasa çandî ya gelen Aryan, ên mensûbê Arî derdikeve û gelên din wek binbêşên xwe qebûl dike. Herwiha di derbarê cejna newrozê tespîten Firdewsî manîpulyasyon e Perskirina newrozê bi temamî tespîteke şovenîst e. (Dağlı 2018)

¹⁸ Faysal Dağlı jî giringiya 21 ê adarê bi teqwîma Avestîk ve îzah dike. Weku Dağlı baldikişîne, meha adarê di zimanê Avesta de wek *Ferwerdin* tê binavkirin. (Dağlı 2019)

Vê temayê, ya ku cudahiya waterdarkirina newrozê di nerîta kurd û farisan de Gürdal Aksoy di der nasnameyên ‘Cemşîd / fars’ û ‘Kawa / kurdan’ re niqaş dike:

Mînak li gorî farisan newroz bêtir bi Cemşîd ve li gorî kurdan jî bi Kawa têkildar e, yê ku Dehakê zalim kuşt û kurdan ji esaretê rizgar kir. Weku din di nerîta farisan de roja ku Ferîdûn derbasî ser text bûye û bi hepskirina Dehak li çiyayê Demawendê¹⁹ diyar e. (Aksoy 1991, 22)

Di qenaata Gürdal Aksoy de şert û mercên gelên fars û kurda ji ber ku ji hev cuda ne, mîta newrozê cuda hatiye famkirin. Aksoy berawirdkirine wiha berfireh dike: “Gava ku ji aliyê farisan ve em lê binerin, ji bo wan tê wateya damêzrîneriya hikûmraniyê. Belê ji bo Kurdan tê wateya rizgarbûna gelekî ku di bin zextê de bû” (Aksoy 1991, 21) Bi rastî jî di vegotina çîroka Firdewsî de temaya mewcûd berawirdkirina Aksoy piştrast dike.

3.8.Baweriyên Arî û Nerîta Kurdan

Ên weku Selahattin Ali Arik di wê baweriyê de ne ku ji bilî Îslamê, baweriyên kurda bi tamamî sînkretîk in û ji kokeke Arî derketine. Arik van baweriyên wiha pêşkeş dike: “Zerdeştî, Manîheîzm, Mazdeîzm, Êzîdîtî, Yaresanî”. Di fikra Arik de baweriyên navborî bi giştî jêdare xwe Mîthraîzmê distînin.

3.9.Mîthraîzm

Heger ku bingeh Mîthra be, divê di dîrokê de em berê xwe bidin dewra Mitaniyan ku peyva ‘Mîthra’ cara yekem di peymaneke aştiyê de derbas dibe, ya ku di nava Mîttaniyan û Hîtîtan hatibû qebûl kirin

Selahattin Arik baweriya Mîthra wiha terîf dike:

¹⁹ Belê Cemşîd Bender di baweriya wî de bûyer ne li çiyayê Damewandê qewîmiye. Ev çiya li dora Ninivê ne. (Bender 1991, 132) Herwiha Bender, Cemşîd wek padişahê kurdên Kassîtî qebûl dike. Hb., r.122

Mîthra, di dema pîrxwedayî de li Rojhilata Nêzîk xwedayekî rojê, xwedayê ronahî yê mezin bû di dewleta Mîttanî de ku ji teref Hurriyan hatibû damêzrandin. Mîthrayê ku li Mezopotamya weku mirov û rojê hatiye şayesandin, ku kontrol dike ji ber ku her tiştî dibihîze û dibîne, di heman demê de Xwedayê ‘Roj’²⁰, Ronahî, Feyîz, Welûdiyê’ û Xwedayê Cengê’ ye. (Arik 2015, 11)

Siraç Bilgin di Ariyên Rojava de, yanî di Medyayê de rola Mîthra wek damêzrenîrê pantheona Xwedayên Arî de giring dibîne. Belê gava ku Zerdeşt hatiye vir ji ber ku di nava wesfên Mîthra de ‘şervanî’ hebû Siraç Bilgin dibêje Zerdeşt wî aforoz kiriye. (S. Bilgin 1996, 14) Belê di pirtûka *Zarathuştra* de Siraç Bilgin di wê baweriyê de ye ku Mîthraîzm tu carî di nava kurdan da giringiya xwe wenda nekiriye. (M. S. Bilgin 2003, 43)

Di nav erkên Mîthra de, yê herî diyarkirî çavderiya wî li ser peymanan e. Siraç Bilgin ji *Avestayê* neql dike, ‘peymanan’ bi ‘hezar hest, hezar guh, deh hezar çav û deh hezar sixurên xwe’ dişopîne. (S. Bilgin 1996, 117) Bi wateyeke din, Mîthra çawa li erdnigariya rojava pêywîreke leşgerî aniye cih, li rojhilat jî wek ‘dadgerekî’ xuya bû ye.

Bi ya Arik Mîthraîzm di dîrokê de vegûherî baweriyên mîna Zerdeştîyê, Elewîtî, Êzîdîtî, Yaresaniyê. Gava ku Zerdeştî di Medya de bû ola fermî, li gorî Arik olên Arî bi giştî herifin di nav wê de. Arik jî baldikişîne, piştî sedsala 7 an dema belavkirina Îslamê li Kurdîstanê baweriyên Arî, ji bo hebûna xwe biparêzin kişiyên cihên ku kes negihêje wan’. (Arik 2015, 12)

Bi rastî heger ku em vegotin û analîza Selahattin Ali Arik rast qebûl bikin, nexwe famkirina ku ev ‘olên Arî’ ji bo çî di paşê de weku baweriyên heterodoks hatine ravekirin, wê hêsantir dibe. Pirtûka Arik, di çanda Arî de, yek bi yek kult, xweda,

²⁰ Siraç Bilgin wek hurgiliyeke behsa kurdên ku di salên 50 î de li ser roj, heyv û asîmê sund dixwarin. (M. S. Bilgin 2003, 18)

firişte û formên olî dide nasin û bi riyeke berawirdî, teşebbûsî lêgerîna koka baweriyên kurdan dike.

3.10. Zerdeşt û Zerdeştî

Zerdeşt di baweriya Siraç Bilgin de pêxemberê Medya ye û di hinek zimanan de weku ‘Zoroaster, Zarathustra, Spîtamâ’ jî derbas dibe. Damêzrînerê ola bi navê Zerdeştîyê ye ku tê zanin ku jêdera vê olê aîdî baweriyeye pîrxwedayi ye, ya ku bi navê Magûtîyê dihate naskirin. Zerdeştî ola fermî bû di sazûmana Medya de. Torî baldikşîne ser welatê Zerdeşt ku bi navê Airyan Vaejah ê di nava sînore Medya de tê zanin. Herçiqas hinek îdîa dikin ku Zerdeşt jêdera wî, ne Kurd e jî li gorî Torî bêguman Zerdeşt teqez ji Medyayê ye. (Tori 2000, 9)

Di nav dîroknasên Kurdan de yê herî bi nasnameya Zerdeşt têkildar bêguman Siraç Bilgin e ku di baweriya wî de Zerdeşt ji malbateke proto-kurd e. Di pirtûka xwe yî bi navê *Aryan Mitolojisi, Yazatahar ve Homa* de dibêje herçiqas Îslam jî bo ku Zerdeştîyê ji holê rake gelekî hewl daye jî, îro gava em li adet û toreyên jiyana Kurdan dinêrin ku nîşanên vê baweriyê pîr in. Siraç Bilgin di pirtûka xwe yî bi navê *Zarathustra* de li ser nasname û koka Zerdeşt pîr disekine:

“Jixwe ji ber vê fikrê min bîryar da ku Zerdeşt bikim mijara xwe, yê ku gelek delîlên xurt henin ku ji malbateke proto-kurd hatiye û di erdên ku kal û bavên kurdan jî xwe re kirine welêt de hatiye dinyayê. Min hest dikir ku bi vê kiryarê ez ê dakevim çavkaniyên kurdan. Bi vê xebatê min ê pîrsgirêkê ji heyama dîroka ku tarî tê hesabandin a heta îro bianiya, vî pêxemberê mezin wek nasnameye proto-kurd derxista holê. Gava min dest bi kar kir di destê min de wêneyekî Zarathustra yê pûç hebû û bi rastî jî bo lewçetiyeke entelektuel ev ne bes bû. Min tenê, îdeolojiya vê pêxemberê mezin ê Ariya Rojhilatî, wek ‘şerê ronahî û tarîfîyê’ formule dikir. Wêneyek razber û ji rêzê bû. Belê di sê salên ku min lêkolîna

xwe didomand belgeyên dihatin destê min û kîsikê min ê agahiyê tije dibû, min ferq kir ku mesele êdî ji cureyeke ku bi şexitandin derdikeve Bi felsefe, nirxên etîk, eskatolojî û pêşbîniya xwe ya civakî Zarathuştra deha bû. Dehayekî ku hatibû jibîrkirin û pergî neheqiyê bûbû. (M. S. Bilgin 2003, 12)

Ev hevok ji çapa yekem a *Zarathuştra* bû, ya ku di sala 1995 an de hatibû weşandin. Piştî Siraç Bilgin vê pirtûkê bi çapa duyem di sala 2003 an de bi berfirehî diweşîne. Di vê çapê de di pêşgotina duyem de Siraç Bilgin baldikişîne ser pêşdeçûna xebatên xwe yê li ser mîtologyaya Arî, ya ku çî çar bergan pêk hatine. Berg bi rêzê wiha ne: *Mîtologyaya Arî, Gathayên Zarathuştra, Newroz, Avesta-1: Vendidad*.

Bilgin me agahdar dike ku di hundirê vê pêvajoyê de li ser *Zarathuştra* bêtir hûr û fêrî alfbeya *Avestayê* buye, êdî dikare berawirdiya bêjeyên Avesta û kurdî bike. Di pêşgotinê de rewşa Siraç Bilgin ji aliyê nêzikahiya dîsîplîna lêkolînereyê pir naîv e:

(...) ji hêla zimanê ku Avesta pê hatiye nivîsandin min xwe pir di destpêkê de didît, bivê nevê bengîtiya min ê berhemên Rojavayî berdewam bû. Ji ber vê yekê min metodekek pir zehmet bi kar anî. Ez neçar dimam, Berhema Pîroz bi gelek berhemên şîrovekarên Avesta yê Rojavayî bi awayekî berawirdî analîz bikim. Bawer bikin ku şev li min herîmî bû, di nav livînan de jî fikrên têkildar di serê min de dizivîrîn. (M. S. Bilgin 2003, 14)

Dîsa jî Siraç Bilgin di vê mijarê de bi awayekî dilnizmî tev digere:

Yên bibêjin Zerdeştî û mîtologyaya Medî ya ku bi demê re hatiye reformekirin, bi temamî famkiriye, ez bawer dikim xwe dixapînin. Ji ber vê yekê ev xebata ku hûn dixwînin tenê wek destpêkekê qebûl bikin. (M. S. Bilgin 2003, 16)

Di perspektîva Siraç Bilgin de Zerdeştî û Kurdayetî bi heman rengî hatiye neqîşandin. Dema belavbûna Îslamê li Îranê bi ya Siraç Bilgin Zerdeştî di bin nasnameya kurdî de li hember artêşên mislimanan şer dikirin. Him di dema Omer û him jî ya Elî de Siraç Bilgin dibêje kurdên zerdeşt geh bi xaracan û geh bi şer berxwedenên dîrokî pêk anî bûn. Di pênûsa Bilgin de kurd û Zerdeştî ji hev naqetin û bi awayê hêzêke dij-kolonyal li hember ‘yê din’ disekine. Li vir Siraç Bilgin Zerdeştîyê dike ola kurdî ya netewî ku hest û rihê kurdewar tê de kemiliye. (S. Bilgin 1996, 152-154)

Di *Zarathustra* de me dest nîşan kiribû ku Siraç Bilgin îdîa dikir ku Zerdeşt ‘proto-kurd’ e û yekem pêxemberê Arî jî Manûskîhar e, yê ku ji secereya Thraetoanayê ku (Ferîdun) Dehak têk biribû û wî li çiyayê Daena hepsikiribû, dihat. Me berê jî gotibû Siraç Bilgin di nasnameya Zerdeşt a kurdî de tu gûmanan qebûl nake. Dixwaze vê ya jî bi awayekî dîrokê û zanistiyên din ve ispat bike. Belê di destê wî de tenê kronolojî heye. Hebûna dîrokî ya Medya: Siraç Bilgin argumanên xwe bi giştî li ser vê kronolojiyê kom dike.

Siraç Bilgin di derbarê nasnameya Zerdeşt a kurdî de pir bi israr e. Ji bo vê nasnameyê piştrast bike di serî de li ser welatê Zerdeşt çend gotin û analîzan peşkeş dike. Belê divê bê ilawekirin ku ne çavkanî yê Yûnanî ne jî yê Erebî piştevaniyê ji Bilgin re nakin. Yê ewil (Yewnanî) nasnameya wî xweşik nekolandine û gelek bi çîrokan ve hunandine. Ji ber ku Zerdeştî ji Îslamê re xetere ditîne ereb jî nasnameya wî li nav hev xistine.²¹

²¹ Mînak Taberî wî kiriye pêxemberekî Cihûyan. (M. S. Bilgin 2003, 128)

Li gorî Siraç Bilgin elameteke giringtir heye: sîstema Magûtiyê. Bilgin dibêje em nikarin vê sîstemê aîdî Persan bibînin; - ji ber ku Pers ji Magûyan hez nedikirin û heta Darius gelek caran li ser wan zextên mezin bi kar anîye: Qewirandin, qetlîam û qirkirina Magûyan ji bo Persan wek serkeftineke mezin e tê dîtin ku di pêncên gulanê de mîna cejneke pîroz dikin. Ewçax Magû teqez ji Medya ne û poleke ruhban ê kurdan nîşan didin. Siraç Bilgin wiha dinivîsîne:

Ji bo ku mirov ji hinekan xerabiyê bibînê divê li cihêkî li hev rast werin. Ev tê wateya ku hem Zarahuştra hem jî Daevakar li erdnîgariyek hevpar jiyane. Wek ku me li jorê jî destnîşan kiriye; ji ber ku welatê Mazandaraniyan li başûrê Behra Hezarê ye, ji ber ku mezinê ola Daeva- Yasnakariyan Magûyên Medyayî ne, ji ber ku ji van olan yek jê tevî ku bi naveroka xwe ber bi nêzîkbûna Zerdeştîyê ve guheriye û hêj jî li erdnîgariya kurdan bi berdewam e, em digihêjin vê encamê ku erdnîgariya pêwendîdarên van olan li xaka Medyayê digihêjin hev. Wek ku me berê jî anîbû zimên, olê Daeva- Yasnakariyan yek ji çavkaniyên serekeyên ola Kurdên Êzîdî ne ku di tevahiya dîroka xwe de tûşî zilm, kêmdîtin û qirkirinê bûne. Di vê navberê de divê mezheba kurdên zaza “Homa” jî neyê ji bîrkirin. Bi van egeran Daeva- Yasnakariyên ku di dema Zarahuştra de dijiyan, pir an jî hindik pêşiyên kurdên îro ne. Ev yek xak e ku lê bi cih bûne jî piştrast dibe.” (M. S. Bilgin 2003, 150)

Ji bo pêwendîya kurd û pirtûka *Avesta* di destê Siraç Bilgin de delîlê herî xurt pola yên Magû ye. Li gorî Bilgin pola Magû, ola Zerdeşt wek formeke kurdî vesazkirine. Bi wateyeke din, bi saya pola Magûyan Zerdeştî bûye ola netewî ya

kurdan. Heta li cihekî Bilgin dibêje kîjan lêkolîner be, gava ku li dû şopa *Avesta* bigere, heger Magûyan nexa nava mijara xwe wê tûşî xeletiyek mezin bibe

Yek jê jî dema ku jiyaye: Siraç Bilgin herçiqas ji ber ku Zerdeşt mît e û li mîtan dîrok naye birîn jî dîsa bi saya metnên Rig Veda û Gathayan çend texmînan bikin ku her du jî bi zimanên Arî hatiye nivisandin. Her wekî din, Zerdeşt li Rojhilatê Îranê bi piştevaniya Magûyan fersenda belavkirina ola xwe bi dest xistiye. Siraç Bilgin bi îsrar dibêje, em nikarin hebûna dîrokî ya Zerdeşt têxin beri zayînê, ya din 843 an de.²²

3.7. Elewîfî

Li gorî fikra Cemşid Bender ji ber ku di hundirê xwe de gelek hêmayên berxwedanê û redkirina îqtîsarê dihewîne Elewîfî ji bawerî û çanda kurdan ve derketiye holê. Herwiha bêguman Zerdeştî û Êzdiyatî bi nerîta xwe şêwe daye Elewîtiyê. (Bender 1991, 93)

Bi ya Bender serokê serhildanê Baba Îshak di şopa ‘serdarê Ebu Muslîm Horasaniyê Kurd’ de bû û gava ku serhildan organîze dikir digot: “Ebû Muslîme nemiriye û wek qasid û rizgarkerê Zerdeşt wê rojekê vegere.” (Bender 1991, 115) Di vegotina Bender de bergeheke wiha derdikeve ortê: Bi serokatiya kurdan ve gelê di bindest de di binê femandariya Baba Îshakê kurd de li hember zilm û zordariya Selçûkiyan serî rakir. Li gorî Bender Elewîfî baweriyeke kurdan ya resen e:

²² Li ser meseleya Gathayên Zerdeştî û têkiliya ziman Siraç Bilgin çend tiştên balkêş dibêje. Siraç Bilgin ji ‘delîlek’ din jî sûdwerdigre; “Ew jî baweriya ontolojiya yê Arî ne, yen ku di hişmendiya wan de dinya li gorî teqwîma Zodyak 12 hezar sal temenê wê heye. Ê ku Viştaspa heger k udi sala 9001 î de bûbû ‘Bahdini’, evçax ev dem miqabilî pêxembariya 12 salî ya Zerdeşt dike.” (M. S. Bilgin 2003, 171)

Alewîfî ya ku hilberîneke şaristaniya kurdî ye, dema ku di warên siyasî, civakî û aborî de jî “baweriya felsefeyê” û “şêwaza jiyanê” afirandiye, wêrekî daye gel û li hember rêveberiyên xerab riya serhildanê daye ber gel. Piraniya bertekên civakî yên ku gelê Kurd bi sedsalan e rêdaye bi rengê “olî” ne. Kurd ji bo ku girseyan tev rakin ji dewlemendiya baweriyên îstîfade dîtine. Teqînên civakî bi pêkerên olî hatine xwedîkirin û ji bo serhildanan rewşeke baş avakirin. Qe nebe wiha dihat xuyakirin. Ji bo serhildanên bê belavkirin û bi piraniya girseyên gel ve bê qebûlkirin pêkerên “olî” nehat paşguhkirin. Serhildanên ku bi serdarê Kurd Ebû Muslîm Horasanî destpêkirin, bi navber li Anatoliyê heya sedsala 13. Dewam kir. Bi serhildana Babai ya ku Îshaqê Kurd derxistibû jî gihast pileya herî jor. Serhildana ku bi rêberiya gelê Kurd li bajarên biçûk û herêmên gundewarî hat destpêkirin, li gor karakterê xwe yê olî jî Ermen, Rûm, Koçberên Tirkmen û Suryanî jî xistin nav xwe û wek çiyayekî mezin bû û di dîroka Anatolê de şopek hişt. (Bender 1991, 57)

3.8.Zimanê Kurdî û Jêdera Arî

Vladimir Minorsky, gotara xwe yî ku di *Îslam Ansiklopedisi* de hatibû weşandin têkildariya zimanê kurdî û Îranî bi awayekî balkêş wiha bi cih dike “Hesibandina kurdan ji qewnên Îranî ne ji aliyê nijadê, bêtir bi ziman û dîrokê ve têkildar e.” (Aksoy 1991, 147) Minorsky bawer dike ku zimanê kurdî ji gelek aliyên ve ji kokeke Partî heta pileyekê jî ji kokeke Medî ye: “Minorsky digihêje vê encama ku di teşekkul û terkîba zimanê nijada kurdî de Partî û Medî roleke mezin listîne.” (Jwadih 2016, 41)

Gürdal Aksoy di navbera zimanê Sumerî û zimanê Kurdî kokeke hevpar dibîne. Heger ku em Sumerî jî daxilî pola Hind-Ewropî bikin (ku meyl wiha ye) ewçax Aksoy rast dibêje. Belê meseleya Sumerî ne tenê ya ziman e;- bêtir bi dewlemendiya şaristaniya wê jî gelekî têkildar e. Ji ber ku di dîrokê de him ji aliyê nivîsê him jî ji aliyê dîrokeke qedîm Sumerî wek ‘dergûşa şariştaniyê’ tê hesabandin ku ev rewş gelek rewşenbîrên netewperwer li ber cazîbeya kokeke Sumerî lawaz dihêle.

Gürdal Aksoy ji bo ku nêzikahiya zîmana îspat bike di navbara Kurdî û Sumerî de gelek bêjeyên hevpar dijmêre. Gürdal Aksoy di kurdî de peyvên weku ‘hirç’, ‘zan’, ‘pîrs’, ‘mirin’ di gelek zimanê Arî de tespît dike.

Siraç Bilgin di beşa *Aryan Mitolojisi, Yazatahar ve Homayê*, ya dawiyê de peyva Kurdî ‘war’, miqabilî ‘Vara’ dibîne ku ev peyv di çîrokeke versiyona tofanê derbas dibe, çîroka ku jêdera wê Arî ye. Li gorî vegotinê Xwedê, Yima hişyar dike ku wê di demekê nêzik de şert û mercên hewayê li nav hev keve û tofaneke mezin derkeve holê da ku hemû jîndar ji holê rabin. Ji ber vê yekê divê Yima, ‘Vara’ însa bike. (S. Bilgin 1996, 66) Dîsa di nava rengdêrên Mîthra de ‘pûthro’ diyar dike ku li gorî Bilgin di kurdî de ‘pîto’ bi xwe ye. (S. Bilgin 1996, 120)

Cemşîd Bender di ser zimanê Urartuyan de têkiliyekê di navbera zimanê Arî û Kurdî de çêdike. Bi ya Cemşîd Bender him ji dengzaniyê û him jî ji aliyê morfolojîyê gelek nêzikahî di nava her du zimanan de hene. (Bender 2001, 11) Gelek caran Cemşîd Bender bo ku îdîayên xwe piştrast bike gavên dervî zanistê jî diavêje. Erê di nava zimanên Hind-Ewropî de helbet nêzikahiyên mezin henin û dîsa dikare bê gotin ku jêder yek e. Belê Bender ji repertuara her du zimanan çend bêjeyên dişibin hev radihêje û îdîayên mezin pêşkeş dike. Dîsa mixabin Cemşîd Bender pir caran koka hinek peyvan jî tevlihev dike. Bêjeyên ku ji Erebî derbasî Kurdî bûne (mînak ‘his’) orjînalê wê Kurdî dihesibîne. Bo numune, wê peyvekê ji rêzê bi zimanê Urartuyan berawird bike û demildest dibêje, “Binerin ji vê minakê em fam dikin ku jêdera Kurdî û zimanê Urartuyan yek e. Ewçax bêguman Urartuyî di eslê xwe de kurd in.”

Cemşid Bender li ser Tofanê çend tiştên balkêş dibêje û dîsa hunerên xwe yî etîmolog rê me dide. Li gorî Bender piştî ku tofan qediya keştiya Nuh li Kurdistanê, li çiyayê Cûdî rûnişt. Jixwe Cûdî, di zimanê Kurdî de ji ‘cî-dî’ tê. (bi Tirkî: ‘yer buldu’ Tenê ev delîl bes e ku em bêjin tofan li kurdistanê qewimiye û jiyana duyemîn li vê erdnigariya pîroz dest pê kiriye. (Bender 1999, 98) Bi ya Cemşid Bender ji hêla nivîsê zimanê kurdî xwedî 5000 salî ye û piştî ku padişahê Îranê, yê bi navê Sirius Medya hilweşandin edeyata xwe bi tamamî ji yên kurdan ‘îqtîbas’ kirin. (Bender 1991, 43)

3.9.Kurd û Samî

Mîta Newrozê ji serê heta bînî pêvçûna Kawa û Dehak vedibêje. Nasnameya Dehak pir hatiye niqaşkirin. Îbrahim Hamî Danişmend îdîa dike ku Dehak hikumndarekî Ereb û jêdera wî Samî bû. Di ser vê re em dikarin dîroka netewî ya kurdan li ser motîva Dehak re dendikeke antîsemîtîk bibînin. Gava ku Medya di dîrokê de geş bû ku ew bi saya têkbirina Asuriyan bû. Hinek lêkolîner nasnameya Dehak bi Asuriyan ve têkildar dikin. Ewçax têkçûna Dehak û têkçûna Asûr di heman çarçoveyê de tê dîtin ku li gorî felsefeya dîrokê watedar e ev rewş

Gürdal Aksoy li ser nasnameya Kawa xebateke pir baş nivîsiye. Di xebata Aksoy de tiştê balkêş ew e ku pirsgirêka Dehak zêdetir derketiye pêşîn. Aksoy di Taberî, *Avesta* û çend pirtûkên mîtolojiya Arîyan de li pêy şopa Dehak digere. Jixwe Dehak di dîrokê de, ya rast di dîroka newrozê de temsîla nebaşî û zilmê ye. Ji ber vê yekê Dehak weku di gelek mitolojiyan de derbas dibe, ne mirovekî xwerû ye. Di hinek metnan de weku ejder, cin, dêw, yan jî şeytan derbas dibe.

Aksoy pir li ser *Avestayê* disekine ku di bawariya wî de Ferîdûn li vir miqabilê Thraeotaona, Dehak jî miqabilê Azhi-Dehaka ye. Di *Avesta* de hêza xirabiyê jixwe tê zanîn Angra-Mainyu ku Azhi-Dehaka ji teref vê hêzê hatiye afirandin. Lewma di xwezaya Dehak de xerabî diyar e. Ji ber vê yekê Gürdal Aksoy, pevçûna di nava Kawa (yan jî Ferîdûn) û Dehak de daxilî çarçoveya dîroka raman, felsefe û olê dike. Kiryara lêgerîna Aksoy di ser Kawa û Dehak de digihêje famkirin û kişfa mîrasa Arî ya giştî. (Aksoy 1991, 53)

Dehak li gorî Siraç Bilgin jî ‘Aji Dehaka’ ye:

Aji Dehaka wek cinawirekî ji koka xerabiyê hatiye tarîf dibe. Şecereya terefê bawî wiha ye: Xrûstâsp, Zâînîgâv, Virafsang, Tâz.. Ev Tâz yan Taj tê zanin, mêrêkî ku ebeweynên wî Ereb bûn tê qebûlkin. (...) Wek tê ditîn, Angra Mainyu (bavê xerabiyê) ji aliyê şecereyê, bapîrê Aji Dehakê dawîn e (S. Bilgin 1996, 68)

Di baweriya Gürdal Aksoy de di *Şahnameyê* de kuştina Merdas bi destê lawê wî Dehak, dikare weku têkbirina Asûriyan ji teref yekîtiya Babîlî û Medan ve jî şîrove bibe. (Aksoy 1991, 44) Herwiha Gürdal Aksoy di xebata *Kürt Dili ve Söylenceleri* de nasnameya Kawa jî dixê nava niqaşê. Li gorî Aksoy Kawa ji aliyê hebûna dîrokî ve gelek pirsgirêkan derdixê. Ji ber ku, dupat dike Aksoy, navê Kawa di tu klasikeke dîrokê de yan jî di belgeyê dîrokê de derbas nabe. Xuyaye *Avesta* di meseleya olên Arî de pirtûka herî pîroz e. Herçiqaq navê Kawa derbas nabe jî Dehak tê de heye.

Bi rastî tenê em ji mîta Newrozê sûdwerbigirn em dikarin çend kelaman li ser têkiliya di nava Kurdan û Arîyan de bikin. Ji ber ku Dehak weku Azhi Dehaka derbas dibe di Avestayê de jixwe. Gürdal Aksoy jî di wê baweriyê de ye ku ‘Dehak’ û ‘Azhi Dehaka’ heman kes in.

Em bîen ser mijara di tegihîştîna dîroknivîsiya kurdan de ‘antîsemîtîzm’ de, tişteki balkêş ew e ku li vir di wateya klasîk de dijmintiyê mezîn /antîsemîtîzin em tê de nabînin. Belê ji hêla biçukdîtin yan jî redda çand û felsefeya samiyân ve çend motîv xuya dibin.

Mînak Siraç Bilgin baweriyên Arî bi her awayî ji baweriyên Samî bilindtir dibîne. Li gorî Bilgin, di serî de di ola Samiyân de du hêzên asîmetrîk hene. Xwedê şeytên afirandiye û pê re şer dike, ji ber vê yekê di vê ‘pêşbaziye’ de bi têgeha Siraç

Bilgin ‘şîke’ heye. Belê di baweriya Arî de him xerabî û him jî başî di heman astê de ne. Şer simetrîk û adil e (S. Bilgin 1996, 13)

Herwiha li gorî Siraç Bilgin di mîtolojiya Arî de tu gotin bi kêfî nayê bi kar anîn:

Tu têgehên razber ji jiyana madî ne xalî ye. Ev, dibe ku ji salan hatibin dawerîn û derbasî û metnên olî bûbûn (...) Gava ez behsa mîtologyaya Arî dikim di serî de ez vê ya dupat dikim ku, çi têgehên mîtolojîk hebin, ew bixwe miqabilî tiştên jiyana reel, a li ser rûyê erdê ne. (S. Bilgin 1996, 179)

Dîsa bi ya Siraç Bilgin afirandin di Ariyan de, ne weku di Samiyan de ji nişka ve çêbû. Bi qademe qademe pêk hat. Û ji aliyê afirandin û bicihkrina mirov jî baweriyên Arî tu valahî nehiştine, berovajî Îslam û Mesîhîtiyê. (S. Bilgin 1996, 45) Heta di diyardeya ‘giloveriya dinyayê’ de jî, berovajî mît û baweriyên nerîta semîtîk li gorî fizîka îro di Ariyan de bêtir zanist e. (M. S. Bilgin 2003, 170)

Di behsa piştî mirina mirovan de Siraç Bilgin baweriyên Arî bi wateya hevgirtî û bêdudilî çêtir dibîne ji yên Îslamê. Mînak di baweriya dogehê de Îslam pir tund e. Belê kozmogoniya Arî de dogeh ne cihekî ebedî ye;- bêtir hêlekê wê yê ‘rehabîlîteyî’ heye kesê ku dikeve wir piştî paqijiyekê derbasî bihuştê dibe. Li vir dogeh roleke qeç dilize. (S. Bilgin 1996, 94-95)

Belê weku di gelek çavkaniyan de tê gotin Îslam (yanî nerîta semîtîk) gelek motîv ji baweriyên Arî stendine. Siraç Bilgin dupat dike, teoriya ku felsefeya Arî ji bo gerdûnê damêzrandiye, bi giştî û bi heman awayî derbasî nerîta Îslamê bûye. Bi riya ravekirina modela gerdûnê ve baweriyên Arî û nerîta Semîtîk di heman ast û ahengê de ne. (S. Bilgin 1996, 25)

Li der mijareke din em vê biçûkditîne di fikreke Ethem dibînin. Gava di navbera Sumerî û yên Samî de behs merivantiyê dibe Ethem Xemgîn pir aciz dibe.

Bi ya Xemgîn ku em li çanda Sumerî ya bilind binerin em nikarin îdîa bikin ku gelekî Semîtk ewqas pêş ketibe. Em ji pirtûka Cemşid Bender neql bikin:

Li gorî nivîskar (Ethem Xemgîn) teza ku (Sumerî) Erebi in qet nehatiye îspatkirin. Di demeke wiha kevn de tu îşaret û delîl nehatiye ditîn, ya ku bi riya deryayê yan jî bi lingan ji ser Efrîqa ber bi deltaya Sumerî ve bûyera koçeke ku qewîmiye. Herwiha di wê demê de gelekî semîtk ne mumkin e ku bigihêje pileyeke wiha pêşketî. (Bender 1999, 40)

Bi ya Cemşid Bender, Zerdeşt di ser hemû pêxemberan û *Avesta* jî di ser hemû pirtûkên semawî re ne. Heta ku em ji Cemşid Bender bawer bikin, *Tewrat* ji *Avestayê* gelek tişt stendiye. Bi wateyeke din, ew teoriya ku heta niha gelek bi hêz bû di dîroknivîsiya olan de, ya ku dihate pêşkeşkirin ku jêderan hemû olên semawî nerîta yê Samî ne ji teref Bender tê binpêkirin. (Bender, *Kürt Mitolojisi-1* 1999, 75) Bender gaveke din diavêje: “*Tewrat*, mîtolojiya kurdan ji 2000 sal berê ve tomar kiriye.” (Bender 1999, 85) Di pirtûka xwe yî *Kürt Halk Uygarlığı ve Uygarlığı* de Cemşid Bender vê carê destana Gilgameş bi çanda kurdan ve têkildar dike û heta dibêje helbestvanekî kurd (Lekke-Unnini) yekem car ev vegotin tomar kiriye da ku derbasî nivîsê bike.

ENCAM

Piştî agahî û niqaşên ku me di vê xebatê de anî ziman wek bilançoyê di vê beşê de em ê li ser çend xalan bisekinin. Di *Kurdên Arî: Mît, Dîrok û Îdelojî* de armanca sereke ev bû: mîta Arî di Ewropa de çawa roleke giring lîstibû û di dawiyê de çawa ketibû destê Naziyan ku ji teref wan ji bo ‘îdealên’ xwe wê çawa veguhezandibûn amûreke nijadperest. Me hewl da ku ev rewş gelo di qada kurdî de çi encam derxistibûn. Di mîta Arî de kişîkirina nasname, çand û zimanê raser me ferî vê dersê kir ku, bawerî wek Eliade jî dupat dike, ji mîtan re şert û mercên sereke bin jî, ji cihekî pê ve pir misade ne ji bo ‘sûstimal û manîpûlasyon’ê.

Ji xebatên wan xuyaye mîta Arî di rewşenbîr û nivîskarên kurdan de kelecana û motîvasyonên mezin dabîn kiribû. Ku ev hest hîn jî di merîyetê de ye û di demekê nêzîk de bi ihtimaleke mezin wê berdewam be. Arîbûn ji kurdan re tê wateya nasname û çandê serbilindî, cudahî û xweseriyê. Ne tenê di helbestan de di pirtûk, risale, nivîsên malperî û manîfestoyên siyasî de jî ev mît bi wesfên navborî dikare bê dîtin. Ji aliye helbestê ve Zülküf Ergün di pirtûka *Nerît û Helbestê* de xwendin û analîzên baş kiribû di derbarê mîta Arî, yên ku di helbestên xwe de wê bi kar anîbûn. Di vê xebatê de me teorî bêtir kir meseleya sereke. Di warê teoriya mîta Arî de di tirkî de çend xebatên baş henin. Pirtûka Leon Poliakov ya *Ari Miti Avrupa'da Irkçi ve Milliyetçi Fikirlerin Tarihi*, Maurice Olender ya *Cennetin Dilleri*, Martin Bernal ya *Kara Athena* rasterast bi vê mijarê ve têkildar in ku ev jî temamî werger in jixwe. Di kurdî de ne werger û ne jî telîf tu xebatên xweser tune. Ji ber vê yekê cihgirtina teoriya mîta Arî bi vê çendaniyê ez bawer dikim ku wê gelekî bi fêde be ji xwîneran re

Di beşa sêyem de me dît di mijara dîroknivîsî û têgihiştina kurdan ya di derbarê demên antîk de mîta Arî di têgihiştinê de konsensûsek peyda kiriye. Herçiqa di *Rojî Kurd* de nasnameya Îranî ya kurdan weku destpêkê hatibû pêşkeşkirin jî, ev mît ji cihekî fireh û bi detay ji xwe re bêtir di *Jînê* de dîtibû. Piştî serhildana Agirî têk çû, serokê wê Îhsan Nuri Paşa di pirtûkên xwe yên *Kürtlerin Kökeni* û *Ağrı İsyanı* de kurdan bi kokeke Arî vê îzah dikir. Bi rastî di nerîta kurdan

de ev hêma balkêş e, ya ku serokên serhildanên kurdan ji aliyekî wek leşker û ji aliyekî din ve bi wesfê dîroknaşan hewl dabûn ku du erkan bi hev re bi cih bînin. Fırat Aydınkaya di kovara *Birikimê* de nivîsek bi vî rengî, bi navê ‘*Kalem ve Kılıç: Kürt Mücadelesinde Şiddetin Tarihi ve Anlam*’ nivîsibû ku bi baweriya me yê ku bi mijarê ve têkildar teqez divê wê bixwînin. Ev nerîta ‘Şûr û Pênûs’ li gorî Aydınkaya ji Melayê Cizîrî heta îro geh bi ‘şûr’ geh bi ‘pênûs’ê hîn berwedam e.

Gava ku em li ser nerîta newrozê hûr dibin, ev cejn bi taybetî wek berdewamiyeke di dîroka kurdan cihekî wê yî xweser heye. Siraç Bilgin hin hêma û figûrên newrozê di pirtûka *Zerdeşt*, di *Avesta* de jî kişf dike ku vê berdewamiyê piştrast dike. Heger ku rojekê bi çendîn delîlên xurt nasnameya nijada *Zerdeşt* ya resen bê kişfîkirin wê helbet îdîayên Bilgin êdî balkêştir xuya bike. Ji ber ku Bilgin bi îsrar e di derbarê nasnameya *Zerdeşt*, ya kurdî de. Belê vê yekê jî divê em ilawe bikin ku ev figûrên ku Bilgin kişfîkirine çend dubendiyan jî nîşan dikin. Gelek caran nasnameya *Kawa*, *Cemşîd* û *Dehak* di hin nerîtên din de li nav hev dikeve. Mînak, Li gorî Siraç Bilgin mumkin e ku *Kawayê Hesînkâr*, *Vistaspa* be jî, yê ku piştewanî li *Zerdeşt* kiribû û sencandina xeraca *Arcasp* red kiribû.

Belê mesele tê ser nasnameya *Dehak* pirsgirêkên xerîb peyda dibin. Heger ku *Dehak* di nerîta *Arî* de temsîla ‘yê din’ be û ji kokeke *Samî* be ewçax em ê vê îdîaya *Mehdrad Îzady* çawa qebûl bikin ku *Îzady* digot di rastiyê de ‘*Azhi Dahaka*’ hikûmdarê *Medya* yê dawîn bû. Ku ev îdîaya *Îzady* rast be wê bîngeha teza Bilgin bi temamî wê hilweşe.

Tê zanîn ku di nerîta *Arî* de ‘yên *Samî*’ bi gelemperî wek ‘*dijminê şaristaniyê*’ û ‘*ji ilme bêpar*’ tên dîtîn. Erê nasname û hesta raseriyê bi saya ‘yê din’ geş dibe belê lazim e ku ‘yê din’ xweşik û rast bê hîlbijartin. Îro divê bê bîrê ku di nerîta *Îsraîl* de *daulîzma Golyat* û *Dawûd* bi rastî pir baş û wek mîteke ‘*damêzrîner*’ ya *Îsraîl* gelek di cih de hatiye rûniştîkirin.

Meseleya *Cemşîd Bender* pêwistiyê çêdike ku em cudahiyekê giring ya wî bînin ziman. *Bender* di îdîayên raseriya şaristaniya kurdan (ya *Zagrosan*) de şampîyontiyê ji kesekî din re nahêle. Belê di mijara koça gelên *Arî* de tezek wî resen heye ku divê bê behskirin. Li gorî teoriyê, gelên *Arî* piştî ku li deşta *Îndûs*

şaristaneyek mezin ava kirin piştire bi qeflan koçkirin ber bi Kafkasya û Ewropa ve. Loma Arî bi wateyek din mêvanên daîmî ne di van erdan de. Helbet li gorî teoriyê Kurdîstan jî di nav vê erdinîgariyê de tê hesabandin. Belê Cemşid Bender vê teoriyê tu carî qebûl nake. Erê kurd ji gelên Arî ne belê ji hin cihên dinyayê bi riya koçê ve nehatinin vir. Kurd gelê vir ê otokton in û şaristaniya Mezopotamya bi temamî (çi Arî çi Samî be) ev hilberandine. Ewçax bi hezar salan kurd li vir, li Zagrosan jiyane û di Kurdîstanê de him cara yekem û him jî piştî tofanê cara duyem jiyane dest pê kiriye. Jixwe Bender di nava *Tewratê* û *Avesta* jî hêla kurdewariyê tu ferqê nabîne. Her du pirtûk, her du nerît (Arî û Samî) jî malên kurdan in.



ÇAVKANÎ

Alan, Remazan. 2013. *Roman û Folklor, Li Dor Texeyyulên Berê Rêçên Îroyîn*, Stenbol, Peywend.

Aksoy, Gürdal. 1991. *Kürt Dili ve Söylenceleri Üzerine İncelemeler-1* . Ankara: Öteki .

Anonîm, 2015. 'Arya', <http://www.iranicaonline.org>. 15 Tebax. <http://www.iranicaonline.org/articles/arya-an-ethnic-epithet>.

Anderson, Benedict. 2015. *Hayalî Cemaatlar*. Wer İskender Savaşır. İstanbul: Metis.

Arik, Selahattin Ali. 2015. *Aryan İnançlar ve Rêya / Raa Heqîye, Mîthra, Zervan, Zerdüşt, Manî, Mazda, Yarasan, Êzdaiyatî ve Kürd Aleviliği*, . İstanbul: İsmail Beşikçi Vakfı.

Arvidsson, Stefan. 2006. *Arî İdols, İndo-Europen Mythology as İdelogy an Science*. Wer Sonia Wichmann. Chicago: The University of Chicago Press.

Assmann, Jan. 2016. *Mısırlı Musa, Batı Tektanrıcılığında Mısır'ın İzi*. Wer Bozkurt Leblecioğlu. İstanbul: İthaki.

Aydinkaya, Fırat. 2015. «Kalem ve kılıç: Kürt mücadelesinde şiddetin tarihi ve anlamı.» *Birikim*, Berfanber.

Başçı, Veysel. 2019. «Ehmedê Palo'nun Şiirlerinde Mitler, Kült İnanışlar ve Efsanevi İmgeler.» *Kürt Tarihi*, H.35

Babha, Homi K. 1990. *Nation and Narration*. London: Routledge

Beşikçi, İsmail. 2013. *Türk Tarih Tezi "Güneş - Dil Teorisi" ve Kürt Sorunu Bilim Yöntemi Türkiye'deki Uygulama* . İstanbul: İsmail Beşikçi Vakfı .

Bedlîsî, Şerefhanê. 2014. *Şerefname, Dîroka Kurdistanê*. Wer Ziya Avcı. İstanbul: Azad.

Bitlîsî, Kurdîyê. 1335. «Kürdler İranî Değil midir?» *Jîn*, Gûlan.

- Bender, Cemşid. 1991. *Kürt Halk Uygarlığı ve Uygarlığı*. İstanbul: Kaynak.
- . 1999. *Kürt Mitolojisi-1*. İstanbul: Berfin .
- . 2001. *Kürtlerin Kökeni Ari Boylarından Urartular*. İstanbul: İstanbul Kürt Enstitüsü.
- Bender, Cemşid. 1991. «Memê Alan Destanı ve Kürt Uygarlığı.» *Berhem*.
- Benjamin, Walter. 2000. *Son Bakışta Aşk*. İstanbul: Metis .
- Bernal, Martin. 1987. *lack Athena: The Afroasiatic Roots of Classical Civilization : The Fabrication of Ancient Greece, 1785-1985*. New Jersey: Rutgers University Press.
- Bilgin, M. Siraç. 2003. *Zarathustra*. İstanbul: Berfin.
- Bilgin, Siraç. 1996. *Aryan Mitolojisi, Yazatalar ve Homa*. İstanbul: Doz.
- . 2018. *Newroz*. İstanbul: Do.
- Bruinessen, Martin van. 2005. «Ehmedê Xanî'nin Mem û Zîn'i ve Kürt Milli Uyanışının Ortaya Çıkışındaki Rolü.» *Kürt Milliyetçiliğinin Kökenleri* içinde, ed: Abbas Vali. İstanbul: Avesta.
- Childe, Gordon. 2018. *Arryanlar-Hint-Avrupa Kökenlerine Dair Bir İnceleme*. Wer Ceren Can Aydın. İstanbul: Alfa.
- Ciavatta, David. 2016. «Mutlak Özgürlük Olayı: Hegel'in Fransız Devrimi ve Cumhuriyet Takvimi.» *Doğu-Batı*, Tebax, Îlon, Cotmeh.
- Cibo, Nezîrê. 2004. «İhsan Nuri Paşa (1893-1976).» *Kovara Bîr* (7): 75-89.
- Corm, Georges. 2011. *Avrupa ve Batı Miti Bir Tarihin İnşası*. Wer M. Işık Durmaz. İstanbul: İletişim.
- Dağlı, Faysal. 2018. *Kürtlerin Bayrak Günü ve Bayrağın Önemi*. 19 12. Gihiştin: 06 06, 2019. <http://www.dengekurdistan.nu/authors.aspx?an=27162&aid=71>.

- . 2019. *Tarihin Şenliği Newroz*. 22 03. Gihıştin: 06 06, 2019.
<http://dirokakurdistan.com/tr/2019/03/22/tarihin-senligi-newroz/>.
- Demir, Vecdi. 2015. «Celâdet Versus Mustafa Kemal: Bir Mektubun Anatomisi.»
Kürt Tarihi Dergisi, H.18
- Dersimi, Dr. Nuri. 2004. *Kürdistan Tarihinde Dersim*,. İstanbul: Doz.
- Dumezil, Georges, yê ku hevpeyvîn kir: Le Nouvel Observateurê. 1987. *Georges Dumezil'in Gizli Şölenleri*, Wer Mehmet Ali Kılıçbay.
- Dunlap, Knight. 1944. «The Great Aryan Myth.» *The Scientific Monthly*, Cotmeh.
- Eco, Umberto. 2014. *Düşman Yaratmak*. Wer Leyla Tonguç. İstanbul: Doğan.
- Edmundson, Mark. 2009. *Freud'un Son Yılları*. Wer Dost Körpe. İstanbul: Encore.
- Ekşigil, Adnan. 1987. «Georges Dumezil.» *Tarih ve Toplum*, 42.
- Eliade, Mircea. 2017. *Kutsal ve Kutsal-Dışı, Dinin Doğası*. Wer Ali Berktaş.
İstanbul: Alfa.
- Ergün, Zülküf. 2017. *Nerît û Helbest: Nerîta Neteweyî Di Helbesta Nu Ya Kurdî De (1880 - 1970)*. İstanbul: Nûbihar.
- Eribon, Didier. 1987. *Georges Dumezil'le Konuşmalar*. Wer İsmail Yerguz.
İstanbul: Sinatle.
- Geary, P. J. 2017. *Uluslar Miti ve Avrupa Kimliği*. Wer Çağdaş Sümer. İstanbul: Yazılama.
- Ginzburg, Carlo. 2007. *Efsaneler, Amblemler, İzler*. Wer Mehmet Moralı. İstanbul: Kırmızı.
- Gray, John. 2017. *Kuklanın Ruhu*. Wer Dürin Tunç. İstanbul: Yapı Kredi.
- Harman, Ömer Faruk. 2019. «[islamansiklopedisi.org.tr.](http://islamansiklopedisi.org.tr/)»
<https://islamansiklopedisi.org.tr/>. Gihıştin: Pûşber 31.05.2018, 2019.
<https://islamansiklopedisi.org.tr/yafes>.

- Hassanpour, Amir. 2005. *Kürdistan'da Dil ve Milliyetçilik*. Wer İbrahim Bingöl. İstanbul: Avesta.
- Jusdanis, Gregory. 2015. *Gecikmiş Modernlik ve Estetik Kültür*. Wer Tuncay Birkan. İstanbul: Metis.
- . 2001. *The Necessary Nation*. Princeton,: Princeton University Press.
- Jwadiéh, Wadie. 2016. *Kürt Milliyetçiliğinin Tarihi, Kökenleri ve Gelişimi*. Wer İsmail Çekem ve Alper Duman. İstanbul: İletişim.
- Kearney, Richard. 2010. *Çağdaş Filozoflarla Söyleşiler, Kıta Felsefesi Tartışmaları*. Wer Hüsamettin Aslan. İstanbul: Paradigma Yayınları.
- Kona, Prakash. 2015. «21. Yüzyılın Amerikan Manifest Destiny'si.» *Mesele*, Tebax.
- Luca, ean. 1998. *Uluslar ve Milliyetçilikler*. Wer Siren İdemen. İstanbul: Metis.
- Maalouf, Amin. 2018. *9 Numaralı Koltuğun Hikâyesi*. Wer Orçun Türkay. İstanbul: Yapı Kredi.
- Olender, Maurice. 1998. *Cennetin Dilleri*. Wer Nevzat Yılmaz. Ankara: Dost.
- Özcan, Ahmet. 2007. *İmparatorluk Çökerken Yeni Bir Ulus Tahayyülü*. Ankara: Lotus
- Paşa, İhsan Nuri. 1992. *Ağrı Dağı İsyanı*. İstanbul: Med.
- Poliakov, Leon. 2001. *Arî Miti, Avrupa'da Irkçı ve Milliyetçi Fikirlerin Tarihi*. Ankara: Epos Yayınları.
- Popkin, Richard H. 1975. «The Ari Myth: A History of Racist and Nationalist Ideas in Europe. Léon Poliakov , E. Howard.» *The Journal of Modern History*, Berfanber.
- Renan, Ernest. 2016. *Ulus Nedir*. İstanbul: Pinhan.
- Said, Edward. 2017. *Şarkiyatçılık*. Wer Berna Ülner. İstanbul: Metis.
- Schmid, William. 2017. *Düşmanlığın Faydaları*. Wer Tanıl Bora. İstanbul: İletişim.

Sontag, Susan. 2013. *Satürn Yıldızı'nın Aşında*. Wer Osman Akınhay. İstanbul: Agora.

Tori. 2000. *Bir Kürt Düşüncesi Yezidilik ve Yezidiler* . İstanbul: Berfin.

Vali, Dr. Shahab, ê ku hevpeyvîn kir: Vecdi Demir. 2019. *Kawa Kürtlerin kurucu mitinin kahramanıdır Kürt Tarihi Dergisi*, H.35

Winnett, Frederick Victor. 1949. *The Mosaic Tradition*. Toronto: Toronto University Press.

Xemgîn, Ethem. 2004. *Kürdistan Tarihi*. İstanbul: Doz.

Yıldırım, Kadri, Remezan Pertev, ve Mustafa Aslan . 2013. *Ji Destpêka Heta Niha Folklorê Kurdî*. Mardin: Mardin Artuklu Üniversitesi.

T.C.
MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
İNTİHAL RAPORU

Tez Başlığı: KURDÊN ARÎ: MÎT, DÎROK Û ÎDEOLOJÎ

Yukarıda başlığı gösterilen tez çalışmamın kapak sayfası, giriş, ana bölümler ve sonuç kısımlarında oluşan toplam 77 sayfalık kısmına ilişkin 30/07/2019 tarihinde tez danışmanım tarafından Turnitin adlı intihal tespit programından aşağıda belirtilen filtrelemeler uygulanarak alınmış olan orijinallik raporuna göre, tezimin benzerlik oranı alıntılar dahil % 2

Uygulanan Filtrelemeler:

Kaynakça hariç

Alıntılar dâhil

5 Kelimededen daha az örtüşme içeren metin kısımları hariç açıklamalar

Açıklamalar: Benzerlik oranının %1 internet kaynakları ve %1 de öğrenci kaynaklarından oluşmaktadır.

Mardin Artuklu Üniversitesi Turnitin adlı intihal tespit programı sonucunda; azami benzerlik oranlarına göre tez çalışmamın herhangi bir intihal içermediğini; aksinin tespit edileceği muhtemel durumda doğabilecek her türlü hukuki sorumluluğu kabul ettiğimi ve yukarıda vermiş olduğum bilgilerin doğru olduğunu beyan ederim.

Adı Soyadı: Vecdi Demir

Öğrenci No: 16711011

Tarih ve İmza

Programı: Kürt Dili ve Kültürü- Tezli Yüksek Lisans

Statüsü: Yüksek Lisans

Danışman Onayı

A.B.D. Başkanı Onayı

Prof. Dr. Abdurrahman Adak